

KIRD, KIRMANC, DIMILÎ YAN JÎ KURDÊN ZAZA

Malmîsanij

Ji tirkîyê

Hacer Petekkaya (Xecê)
Mîlad Xezalê





KIRD, KIRMANC, DIMILÎ YAN JÎ KURDÊN ZAZA

Malmîsanij

Ji tirkîyê

Hacer Petekkaya (Xecê)

Mîlad Xezalê

 Ziman



SZK 05 | ZIMAN 04

Kird, Kirmanc, Dimilî yan jî Kurdên Zaza

Malmîsanij

Navê pirtûkê bi zimanê tirkî

Kird, Kirmanc, Dimili veya Zaza Kürtleri

Wergera ji tirkîyê

Hacer Petekkaya (Xecê)

Mîlad Xezalê

Edîtorî

Izedîn Mihemed

Redakte

Vîyan Hesên

Xwendina dawîn

Elî Evdo

Rûpelsazî

Ferîd Xelîl

Bergsazî

Mihemed Şêxo

Çapa yekem

Qamişlo, 2023

Weşanên SZKyê, Qamişlo



szkkurdi@gmail.com



00963992584574

Danasîn ne tê da, bêtî destûra SZKyê nabe ku ev berhem ji nû ve bê
çapkirin û weşandin. Hemû mafên vê berhemê ji bo SZKyê parastî ne.



* Dr M. MALMÎSANIJ

Di 1952yan da li gundekê Pîranê (li herêma Dîyarbekirê) ji dayik bûye. Xwendina xwe ya pêşîn û navîn li Dîyarbekirê, ya unîversîteyê di Fakulteya Îlahîyatê ya Ankarayê da temam kirîye. Heşt salan li Kurdistanê mamostatî kirîye. Di navbera salên 1975 û 1981ê da ji ber xebata kurdîtiyê çend caran hatîye girtin û îşkence lê hatîye kirin. Di sala 1982yan da ji welêt derketîye, wekî penaber çûye Swêdê.

Li Parîsê di Unîversîteya Sorbonne Nouvelleê da û li Swêdê di Unîversîteya Uppsalayê da Beşa Zimanên Îranî xwendîye. Di Unîversîteya Linköpingê da (li Swêdê) perwerdeya gelî xwendîye. Di unîversîteya Göteborgê da beşa kitêbxanegerîyê qedandiye û mastera xwe nivîsiye. Sê werzan li Unîversîteya Uppsalayê (li Swêdê) dersên edebîyat û tarîxa kurdan dane. Ji sala 2012an heta 2020î di Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê da dersên kurdî (kirmanckî/zazakî û kurmanckî) dane.

Teza xwe ya masterê di 1998an da, ya doktorayê di 2017an da temam kirîye.

Yek ji damezrînerê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê ye û çend salan serokatîya vê komeleyê kirîye.

Ferhenga pêşîn a diyalakta kirmanckî (zazakî) sala 1987an nivîsiye.

Yek ji redaktor û nivîskarên Kovara Tirêjê (1979-1981) bû. Ev kovar kovara pêşîn a kulturî û hunerî ye ku li Kurdistanê Bakur xwerû bi kurdî derketîye. Herwiha di redaksiyona van kovaran da xebitîye: Hêvî (Parîs), Armanç (Stockholm), Çarçira (Stockholm), Wan (Stockholm), Çira (Stockholm), Vate (Stockholm û Îstanbul). Serredaktoriya Kovara Vateyê kirîye.

Gelek nivîs û wergerên wî di kovar û rojnameyan da derketine. Bi qasî 40 kitêbên wî hatine weşandin. Kitêbên wî bi kurdî (kurmanckî û kirmanckî/zazakî), tirkî û swêdî ne. Hin kitêbên wî bo îngilîzî, erebî û kurmanckîya naverast (soranî), hin şîirên wî ji bo îngilîzî, fransî û swêdîyê hatine wergerandin.

**** Hacer Petekkaya (Xecê)**

Sala 1988an li gundê Bistîne yê Amedê ji dayik bûye. Lîsansa xwe li Zanîngeha Eskişehir Osmangazîyê di beşa Ziman û Wêjeya Tirkî da kirîye. Di 2012an da li Zanîngeha Artukluyê mastera zazakî ya bêtez di Enstîtuya Zimanên Zindî da kirîye. Sala 2014an bi bursa Enstîtuya Kurdî ya Parîsê çûye Fransayê û li Zanîngeha Rouenê di beşa Zimannasîya Fransî da mastera 2em li ser “Navlêkirina Civaka Kurdên Zaza û Zimanê Wan” bi dest xistiye. Ji 2018an ve li rojavayê Kurdistanê dijî û di Zanîngeha Rojavayê û ya Kobanê da waneyên kîrmanckî (zazakî) û rêbazên lêkolînê dide. Ji 2020î ve endama Sazîya Zimanê Kurdî ye. Li wir hem astên kîrmanckî fêr dike hem jî xebatên têkildarî kîrmanckîyê amade dike.

***** Mîlad Xezalê**

Sala 1992yan li gundê Tilmarûfê yê Tirbespîyê ji dayik bûye. Enstîtuya Endazyarî ya Gaz û Petrolê ya Rimêlanê qedandiye. Enstîtuya Şehîd Baz a Zanistên Perwerdehî ya bajarokê Girkê Legê xwendîye. Herwiha Fakulteya Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Kobanîyê qedandiye. Niha endamê Sazîya Zimanê Kurdî ye.

Xebatên wî yên wergerê

Pirtûka Bandora zanistê li civakê “The Impact of Science on Society”, Bertrand Russell, (2023)

Pirtûka Zanistnameya zarokan “Children’s Encyclopedia”, DK, bi hevkarîya Nêçîrvan Evdîlezîz (2023)

Zaza weki pilingan bı dar û şûr û gopal
Berê xwe dane Tırkan, gazi kırım "Ero, Ero!" (1)

Cigerxwin



NAVEROK

PÊŞGOTIN.....	11
I. KIRD.....	17
II. KIRMANC.....	25
Kurr.....	41
III. DIMILÎ.....	43
Dimilî wekî navê cih û eşîrê.....	55
Manendîyên bawerî û kevneşopîyên di nav êzidî û dimilîyan da.....	57
IV. ZAZA.....	69
Peyva "Zaza"yê Wekî Navê Cihî.....	82
ÇAVKANÎ û NOT.....	85



PÊŞGOTIN

Kurdên zaza xwe wekî “kird”, “kirmanc”, “dimilî” û “zaza”; zaravayê xwe jî bi “kirdkî”, “kirmanckî”, “dimilkî” û “zazakî” bi nav dikin. Pîrbûna bergindan ku hemû jî yek watayê didin, girêdayî taybetîyên demografi û bînesazîya civaka zazayan e. Bi gotineka din, ji herêmeka zazanişîn heta herêmeka din, ji hozeka zazayan heta yeka din û ji mezhebekê heta yeka din, ev nav tên guhartin.

Berhema “Kird, Kirmanc, Dimilî yan jî Kurdên Zaza”yê ya Malmîsanijî, ji wan berhemên herî pêşîn e ku vê babeta sosyolenguîstîk a li ser zazayan û zaravayê wan, bi firehî şîrove dike. Berhema orjînal (*Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*) ku bi zimanê tirkî ye û ji 88 rûpelan pêk tê, sala 1996an li Stenbolê, ji nav weşanên Weşanxaneya Dengê derketîye. Di warê xwe da, ev berhem xebata herî pêşîn e ku ji hemû berhemên di pey xwe ra bûye bîngê û çavkanî.

Di vê berhemê da, serê pêşîn herêma kurdên zaza hatîye dîyarkirin. Paşê babeta term û navlêkirinan hatîye ravekirin û li gor taybetîyên demografi û civakî, ew termên navborî hatine polandin.

Di vê xebatê da, danerî xwe spartîye gelek çavkanîyên devkî û nivîskî û ji gelek jêderan nimûne girtine. Herwiha teorîyên li dor mijarê yek bi yek rave kirine û ji hemû hêlan ve nirxandine.

Ev berhem jî di nav da, pîranîya xebatên sosyolenguîstîk ên li ser zazayan, an bi kurdîya zazakî yan jî bi zimanên bîyanî ne. Loma pirtûkxaneya kurdî-kurmançî di vî warê da

qels maye û civata kurmancîaxivan ji van berheman bêpar maye. Ji ber van egerên borî, me ev berhema han anî kurdîya kurmancî ku wekî çavkanî berdestî kurmancîzanan bibe û biçûk be jî, valahîyekê dagire.

Di berhema wergerandî da, nîşe û notên wergêran di jêrrûpelan da hatine dayîn. Lê çavkanî û notên nivîskarî, herwekî orjînalê, li dawîya pirtûkê hatine bicihkirin.

Nimûne û jêgirtinên berhema orjînal, hem ji zimanê tirkî hem jî ji zaravayên zazakî û kurmancî hatibûn wergirtin. Me beşeka nimûneyên tirkî, li ser pêşnîyaza nivîskarî, rasterast di metinê da wergerand û beşa din wekî orjînalê hêla û wergera wê di jêrrûpelê da da. Me nimûneyên zazakî wekî orjînalê hêlan û di jêrrûpelan da wergera wan da û dest neda yên kurmancî.

Di prosesa wergerê da û li gor pêşnîyaza nivîskarî, hin xal ji pirtûkê hatin avêtin û hinên din ji lêkolînên nivîskarî yên dawîyê hatin girtin û li pirtûkê hatin zêdekirin.

Dawîyê, ji bo ku mafê wergerandina vê berhemê da me û di pêvajoya amadekirinê da rê li ber me xist, em ji dil spasîya Malmîsanijî dikin.

Sazîya Zimanê Kurdî (SZK)

Eger em hejmara kurdên dimilî (2) yê ku koçî Rojavayê¹ kirin herwiha yê ku hatin koçberkirin û ji ber “îskana mecbûrî” li wir bi cih bûn nehesibînin, ên mayî li van bajaran dijîn:

1. Semsûr
2. Çewlîg
3. Bedlîs
4. Dîyarbekir
5. Xarpêt
6. Erzingan
7. Erzirom
8. Mûş
9. Sêwaz
10. Sêrt
11. Dêrsin
12. Riha

¹ Malmîsanijî, paşê di lêkolîneka xwe da wisa nivîsîye:

“Niha, ji bilî wan kesên ku koçî rojavayê Tirkîyeyê kirine ...” (M. Malmîsanij, “The Kırmanjki (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues it Faces”, in H. Bozarslan, C. Gunes, & V. Yadirgi (eds), *The Cambridge History of the Kurds*, Cambridge University Press, Cambridge, 2021, r. 663) [nota wergêran]

Di nav van bajaran da piranîya nifûsa Dêrsim û Çewlîgê û beşeka giring ji nifûsa Dîyarbekir, Xarpêt û Erzinganê bi zaravayê zazakî dipeyivin. Li hin bajaran mirov dikare bibêje ku zaravayê dimilî di derûberê navçeyekê da tê axaftin, ji wan bajaran: navçeya Aldûşê ya Semsûrê, navçeya Sêwregê ya Rihayê û navçeya Motkanê ya Bedlîsê. Li bajarên wekî Mûş², Sêwaz, Erzirom û Sêrtê jî hejmara dimilîyan kême.

Li gor encama serjimêrîya giştî ya sala 1950yî ya komara Tirkîyeyê berbiçav e ku ji bilî bajarên li jor, hejmareka biçûk a kurdên dimilîxiv li Meletî, Qers, Gumuşxane û Seyhanê dijî.


Kurdên ku bi zaravayê dimilî diaxivin, li gor herêman bi navên cihêreng wekî kird, kirmanc, dimilî, dimlî, dimbilî û zaza tên binavkirin. Ji bo zaravayê ku pê diaxivin jî kirdkî, kirmancî/kirmanckî, dimilkî/dimilî, dimlî, zazakî yan “so-bê” (şo-bê) (3) tê gotin.

Em ê bi kurtasî behsa van navlêkirinan bikin. Ji bo ku em rê li ber şaştêgihîştinê bigirin, pêwîst e em bi bîr bixin ku kurd peyva “kurmancî”yê li bakurê Kurdistanê (Kurdistana Tirkîyeyê) û Tirkîyeyê ji bilî kurdîya ku

² Malmîsanijî, paşê di lêkolîneka xwe da wisa nivîsiye:

“... di hin herêman da dikare bê gotin ku kirmancî bi tenê di nav sînorên navçeyeka bajêr da tê axaftin. Bo nimûne, Sêwrega Rihayê, Gimgima Mûşê, Aldûşa Semsûrê, Motkana Bedlîsê.” (M. Malmîsanij, “The Kirmancî (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues it Faces”, in H. Bozarslan, C. Gunes, & V. Yadirgi (eds), *The Cambridge History of the Kurds*, Cambridge University Press, Cambridge, 2021, r. 663) [nota wergêran]

dimilî û şêxbizinî (4) pê dipeyivin, ango kurmancîyê wekî zaravayekê kurdî “kurmacî” bi kar tînin. Peyva “kurmac”ê jî ji bilî watayên cuda, li hin deveran bi piranî ji bo kurdên ku bi vî zaravayî dipeyivin, wekî navekî bi kar tê.



I. KIRD



Îro kurdên ku bi zaravayê dimilî dipeyivin, li hin herêman xwe mîna “kird” û zaravayê xwe jî mîna “kirdî/kirdkî” bi nav dikin. Ev peyv, di du berhemên ku di sedsala 19an da bi zaravayê dimilî hatine nivîsîn, bi kar hatine. Tekstên ku Peter J. A. Lerchî di salên 1850yî da ji devê dimilîyekî (kirdekî) girtine, kevntirîn tekstên bi zaravayê dimilî ne (5). Di nav van tekstan da axayê gundê Nêribê (6), Xelef Axa, wisa bangî piştevanên nêribîyan dike:

*“Bawnî axaler, ma şueni qawxe, metersi, eskeri Daqma Begi zav û, hema pyêrû Tirk i, nişêni ma de qewxe biki, ma pyêrû canmirdi Kirdan i ...”*³ (7)

Helbestvanê hezanî Ehmedê Xasî (8) jî di dawîya Mewlûda ku di 1898an da bi zaravayê dimilî nivîsîye⁴, wisa dibêje:

³ “Binêrin axano, em diçin şerî, netirsîn, leşkerên Daqma Begî pir in, lê hemû tirk in, nikarin bi me ra şer bikin, em hemû camêrên kurdan in ...”

⁴ Malmîsanijî, paşê di lêkolîneka xwe da wisa nivîsîye:

“... ku ev berhem nivîsa wêjeyî ya kirmanckî ya herî kevnar e.” (M. Malmîsanij, “The Kirmanjki (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues it Faces”, in H. Bozarslan, C. Gunes, & V. Yadirgi (eds), *The Cambridge History of the Kurds*, Cambridge University Press, Cambridge, 2021, r. 663) [nota wergêran]

*"Temam bi viraştîşê Mewlûdê Kirdi bi yardımê Xalîqî û feyz û bereketê Peyxamberê ma –sellellahu 'eleyhi we 'ela alihi we sellem- bi destê Ehmedê Xasî Hezanîci di hınzar û hir sey û şîyyes serri de, bi tarîxê 'Erebi."*⁵ (9)

Pêwîst e were dîyarkirin ku Kovara "Pîya"yê ya ku propagandaya nekurd bûna dimilîyan dike, di vê nivîsê da ku bi înzaya "Fîlît Siwanîj"î hatîye nivîsîn, di dema latînîzekirinê da, ev hevoka Ehmedê Xasî bi zanebûn destkarî lê hatîye kirin. Nimûne, di teksta orjînal da piştî peyva "Mewlûd"ê herçiqas xal nebe jî Filîtî ji bo tehrîfkirina peyva "kirdî"yê xal danîye û peyva "kirdî"yê ya ku bi alfabeya erebî wekî "KRDY" hatîye nivîsîn jî mîna "kerdi"yê nivîsîye. Ev mînak nîşaneka balkêş e ji bo ku mirov binase bê kesên ku dixwazin nekurd bûna dimilîyan bidin pêş, çî rêbazan bi kar tînin.

Di wê "Beyt"ê da ku bi dimilîyê hatîye nivîsîn û ji alîyê mirîdên Şêx Selahedînê kurê şehîd Şêx Seîdî ve tê gotin, peyva "kird"ê tê bikaranîn. "Beyt" wisa dest pê dike: *"Gelê Kirdo, rind bizonî."*⁶ (10)

Dimilî ji kurmancan ra dibêjin "kirdas" an "kirdasî", ji zaravayên wan ra jî "kirdasî" yan "kirdaskî". Ziya Gökalpî der barê vê mijarê da wisa nivîsîye:

⁵ "Çêkirina Mewlûda Kirdî bi alîkarîya Xalîq û feyz û bereketa pêxemberê me, silav û nimêjên Xwedê lê bin, bi destê Ehmedê Xasî yê hezanî di sala hezar û sê sed û şazdehan da, bi dîroka erebî, temam bû."

⁶ "Gelê kurd, baş bizane."

“... Zazalara gelince, bunlar kendilerine (Arapça harfinin kesresi ile) kird derler. Kurmanclara Kürdasi veya Kirdasi adını verirler. Türkler ise Kürt adını Kurmanclara ayırmışlardır.”⁷ (11)

Kemal Badıllı jî di heman mijarê da wisa dibêje:

“Türkiye deki Zazalar kendilerini asıl Kürt sayarak kendilerine Kird ve kendileri dışında kalan Kürtlere, daha doğrusu Kurmanclara da –biraz da küçümseme ile müterafik olarak– Kirdasi (Kürdümsü, Kürtçük) derler.”⁸ (12)

Gwevdereyic jî di nivîsareka xwe ya li ser Çewlîgê da qala peyva “kird”ê dike:

“Zony Çolig Kird û. Tıkyê merdimy Kird, (zoni) ma ri vony Zazaki, tıkye vony Dimili. Lakin ma vony Kird.”⁹ (13)

Tevî ku heta îro şiroveyên pir cuda li ser reha peyva “kurd”ê hatine kirin jî piranîya kesên ku li vê peyvê dikolin, haya wan ji van her du navên ku civaka zaza xwe bi wan dinavîne; “kird” û “kirmanc” tune ye û hesabê van her du peyvan nekirine. Loma jî nivîskarekê yûnanî Polybeyî (Polibio) berî zayînê bi 200 salî, behsa peyva “Cyrtii”ê, Strabon jî peyva “Κύρτιοι”ê

⁷ “... Herçî zaza ne, ew ji xwe ra kird (bi kesreya tîpa kafê ya erebî) dibêjin û kurmancan jî bi kurdasî yan kirdasîyê dinavînin. Herçî tirk in, wan navê ‘kurd’ê ji bo kurmancan veqetandîye.”

⁸ “Li Tirkîyeyê, zaza xwe kurdên resen dihesibînin, ji xwe ra kird dibêjin û ji kurdên ji bilî xwe ra, ji kurmancan ra, kirdasî (wekî kurd, kurdok) dibêjin. Ev nav hinekî bi wataya biçûkdîtîne ye.”

⁹ “Zimanê Çewlîgê kurdî ye. Hin kes ji [zimanê] me ra zazakî, hin jî dimilî dibêjin. Lê em dibêjin kird.”

(bilêvkirina wê: Kurtioi, wataya wê Kirt ango pirhejmara Kirt) herwiha dîroknasê romayî Tito Livio (54 bz-17 pz) behsa peyva "Cirtei/Cirti"ê dike. Îro li hin herêman kurdên dimilî ji bo navlêkirina xwe, peyva "kird"ê û pirhejmarîya wê "kirdî yan kîrdî" bi kar tînin. Ew lêkolerên ku peyva "kurd"ê dinirxînin, li ser yeksanîya van peyvên dimilî, yûnanî û latînî nasekinin (14).

Di nav dimilîyan da peyva "kird"ê ji bilî wataya fireh a ku li jor hatiye ravekirin, di hin herêman da ji bo civaka ji derveyî malbatên mîr an axayan tê gotin. Mînak, ji civaka Gêlê ya ku ji derveyî malbata mîr (key mîran) û li Pîranê malbata axa (key axayan) ra kird tê gotin. Malbatên ku behsa wan tê kirin, kurd in û civaka ku bi navê "kird"ê hatiye navandin bi heman zaravayî (dimilî) diaxivin. Bikaranîna navê "kird"ê ji bo kesên ji derveyî malbatên axa û mîran, nîşana çînîtiya di nav civakê da ye. Ango bikaranîna peyva "kird"ê bi wataya "kirmanc" an "kurmanc"ê ku li hin herêmên Kurdistanê bi kar tê, bi bîr dixe. Ji ber ku navê "kirmanc" an "kurmanc" herçiqas ji bo kurdên kurmancîaxiv wekî nav tê bikaranîn jî watayek a wê ya duyem jî heye. Em ê li jêr li ser vê yekê bisekinin.

Di nav çavkanîyên nivîskî da zanyarîyên zêde der heqê peyva "kird"ê da tune ne. Lê jêgirtineka di parçenivîseka farisî da ku Nîkîtinî ji destxeteka nivîskarê wê yê nenas wergirtiye, şiroveyeka wisa heye:


"Ji endamên qebîleyê yên resen ra kurd tê gotin (15). Ji yên nekurd (yanî yên ne ji qebîleyê-Malmîsanij) ra ku ji derve tev li qebîleyê bûne jî bi çavê biçûkdîtîne kurd tê gotin ... " (bilêvkirina rast a vê peyvê ku ji parçenivîsa farisî bi tîpên

erebî hatîye nivîsîn, nayê nasîn. Dibe ku wekî kirt û kert jî were xwendin-Malmîsanij) “Di heman demê da ji bo kesê/a ku ji qebîleya xwe veqete û tev li eşîr an qebîleyeka din bibe jî kurt (an jî kirt, kert-Malmîsanij) tê gotin.” (16)

Em bawer in ku ev babet bi rêya agahdarîyên jêrîn ên li ser bikaranîna watayên manend ên peyva “kirmanc”ê dê baştir bihê famkirin.



II. KIRMANC



Hem ji stranên gelêrî yên ku li herêma Dêrsimê bi zaravayê dimilî tên gotin hem jî ji zanyarîyên ku hin nivîskarên dêrsimî didin, diyar e ku kurdên Dêrsimê yên bi zaravayê dimilî diaxivin, xwe bi navê “kirmanc”¹⁰; kurdên ku wekî kurmanc tên zanîn jî bi piranî bi navê “kirdas”ê û zaravayê ku pê diaxivin jî bi navê “kirdaskî”yê yan “kirdasî”yê dinavînin.

Mistefa Duzgun ku yek ji nivîskarên Dêrsimê ye, der barê vê mijarê da wisa dinivîse:

“Dersim halkı nesep (soy) bakımından kendisine ‘Kırmanc’ der. Başka adları kullanmaz. Diyelim ki yabancı birisi ya da Dersimli olmayan birisi dil sürçmesiyle bir Dersimliye ‘Zaza’ derse, Dersimli buna kızar, ‘Hayır, ben Zaza değilim, Kırmancım’ der. Gerçek olan şu ki Dersimli Kırmancılar hiçbir zaman kendilerine ‘Zazayız’ demezler ...”

¹⁰ Malmîsanijî, paşê di lêkolîneka xwe da wisa nivîstîye:

“Kırmancên Dêrsimê yên kirmancıxiv xwe bi ‘kirmanc’ û zaravayê xwe jî bi ‘kirmanckî’yê bi nav dikin.” (M. Malmîsanij, “The Kirmanjki (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues it Faces”, in H. Bozarslan, C. Gunes, & V. Yadirgi (eds), *The Cambridge History of the Kurds*, Cambridge University Press, Cambridge, 2021, r. 664) [nota wergeran]

"... Yine Dersim halkı atalarının topraklarını, Kırmancların ülkesini de 'Kırmancıye' diye adlandırır. Ama Türkçe olarak ya da başka bir yabancı dille ülkelerinden bahsedince 'Kürdistan' derler. Örneğin Dersim'in bilgin, şair ve kahramanlarından olan Alişêr, 'Dersim Türküsü'nde 'Kürdistan' sözcüğünü kullanır. Yine Dersim Kırmancları, Kürdistan'ın özgürlüğü için Türk Devleti ve Avrupa devletlerine gönderdikleri telgraf ve dilekçelerin tümünde ülkelerini 'Kürdistan' diye adlandırmışlardır. Dersim'de 'Kırmancıye' ve 'Kürdistan' sözcükleri arasında hiç fark yoktur ... Yine Dersim'de ülke adı ya da 'Kırmancıye' ve 'Kürdistan' sözcüğü, sadece Dersim için değil, ister 'Kırmanc' ister 'Zaza' ister 'Kur' veya 'Kurd' olsun, bütün Kürt ulusunun ülkesinin adı olarak kullanılır."¹¹(17)

¹¹ "Civaka Dêrsimê ji aliyê nijadî (neseb) ve xwe bi navê 'kirmanc'ê dina-vîne; navên din bi kar nayîne. Em bibêjin ku kesekê bîyanî yan ji kesekê nedêrsimî bi şaşî ji kesekê dêrsimî ra bibêjê 'zaza', yê dêrsimî bi vê aciz dibe û dibêje, 'Na, ez ne zaza me, ez kirmanc im'. A rast ew e ku kirmancên dêrsimî tu carî nabêjin: 'Em zaza ne' ..."

"... herwiha civaka Dêrsimê axa bav û kalên xwe, welatê kirmancan, wekî 'Kırmancıye'yê bi nav dike. Lê eger bi zimanê tirkî yan ji bi zimanekê bîyanî qala welatê xwe bike, navê 'Kurdistan'ê bi kar tîne. Bo nimûne, yek ji zanyar, helbestvan û qehremanên Dêrsimê Elîşêr, di 'Strana Dêrsim'ê da, peyva 'Kurdistan'ê bi kar tîne. Dîsa kirmancên dêrsimî di hemû birûskname û daxwaznameyan da ku ji bo azadiya Kurdistanê ji dewleta Tirkîyeyê û dewletên ewropayî ra hinartine, welatê xwe bi navê 'Kurdistan'ê navandine. Li Dêrsimê di navbera peyvên 'Kırmancıye' û 'Kurdistan'ê da tu ferq nîne ... Dîsa li Dêrsimê navê welêt ango peyvên 'Kırmancıye' û 'Kurdistan'ê, ne tenê ji bo Dêrsimê lê belê ji bo welatê hemû kurdan, çi 'kirmanc' çi 'zaza' çi 'kur' an 'kurd', tê bikaranîn."

Mistefa Duzgun di nivîseka xwe ya din da qala heman mijarê dike:

*“Söz gelimi Dersimliler kendi ülkelerini Kirmanciye (yani Kürdistan-M. D.), kendilerini de Kirmanc (yani Kürt-M. D.) diye adlandırırlar öteden beri.”*¹² (18)

Li gor Zilfiyê dêrsimî jî kirmancîye tê wataya “Kürtlük”.¹³ (19)

Li vir pêwîst e agahdarîyeka Şerefexanî were bibîrxistin ku bi nêrîna wî wîlayeta Çemişgezekê demekê bi navê Kurdistanê dihat nasîn.

*“Öyle ki berat ve emirnamelerde ve diğer sultanlık belgelerinde bu ad geçtiği zaman, yalnız bu vilayet anlaşılır; ayrıca Kürtler arasında Kürdistan sözcüğü geçtikçe, bundan yalnız Çemişgezek vilayeti kastedilir.”*¹⁴ (20)

Wekî li Pîranê, herwiha li hin herêmên dimilîyan jî di cihê peyva “kirmancîye” yê da peyva “kirdane” yê bi kar tînin. Herçiqaş peyva “kirdane” yê sê watayên bingehîn ên nola “kurdewarî”, “li gor kurdîtîyê” û “kurdîtî” yê hildigire jî di heman demê da, tê wataya cihê ku kurd (kird) lê dijîn.

¹² “Dêrsimî jî mêj ve jî welatê xwe ra ‘Kirmanciye’ (ango Kurdistan- M. D.), jî xwe ra jî ‘kirmanc’ (ango kurd -M. D.) dibêjin.”

¹³ “Kurdîtîyê”

¹⁴ “Dema ku di berat, fermanname û belgeyên siltanî yên din da ev nav [Kurdistan] derbas dibe, tenê ev wîlayet tê famkirin. Ji bilî vê di nav kurdan da dema ku navê Kurdistanê tê gotin, mebest jê tenê wîlayeta Çemişgezekê ye.”

Peyva “Kirmancîye”yê ku dimilîyên dêrsimî bi kar tînin û peyva “kirdane”yê ya ku hin dimilî bi kar tînin, ji hêla watayê ve bi peyva “kurdewarî”yê ra hemwata ne. Peyva “kurdewarî”yê ji aliyê kurdên rojhilat û başûrê Kurdistanê ve bi maneya “Kurdistan”ê tê bikaranîn. Bo nimûne, dema ku helbestvan Hêmin di Naley Cûdayî da dibêje: *“Kurdewarî, ey wulatî cwanekem.”*¹⁵ Mebesta wî ji “kurdewarî”yê, “Kurdistan” e. Di ferhenga helbestvan Hejar û di Ferhengî Mehabad da jî peyva “kurdewarî”yê bi heman watayê ye. Di ferhenga D. Îzoli da jî heman peyv bi wataya xwe ya bingehîn, *“Kürde ve Kürt geleneklerine uygun”*¹⁶ tê ravekirin.

Ji aliyê din ve *“Dersim Kırmancıları kendi dillerine de ‘Kırmancı derler... Dersim’de Kurmanc lehçesine ‘Kırdaski’ derler.”*¹⁷ (21)

Zilfo Xaskar jî behsa vê mijarê dike: *“Dersim’de halkın hemen hepsi kendini ‘Kırmanc’ (Kürt) diye niteler.”*¹⁸ (22)

Li gor Xaskarî, li Dêrsimê hem dimilîaxiv hem jî kurmancîaxiv ji xwe ra dibêjin “kirmanc” (23).

¹⁵ “Kurdewarî, ey welatê min ê xweşik”

¹⁶ “Li gor kurd û kevneşopîya kurdî”

¹⁷ “... Kirmancên dêrsimî ji bo zimanê xwe jî ‘kirmancî’ dibêjin ... li Dêrsimê ji bo zaravayê kurmançî ‘kirdaskî’ dibêjin.”

¹⁸ “Hema hema tevahiya civaka Dêrsimê xwe bi navê kirmancê (kurd) dinavînin.”

Li gor agahdarîya ku Malmîsanîj dide, di tirkîya nivîsa Zilfo Xaskarî da peyva “kirmanc”ê bi xeletî wekî “kurmanç”ê hatiye nivîsîn. [nota wergêran]

Niha jî em li hin beşên zêmar û stranên gelêrî yên ku peyvên “kirmanc” û “Kirmancîye” yê di wan da derbas dibin, binêrin:

I. DER LAÇÎ

“... Derê Laçî biwêso

Yivîsê mî, gavan o.

Bira pêro dê, na qewxa aşire niya

Merevê Kirmanci û zalîmanê Tırkan o ...”¹⁹ (24)

II. SEY USÊN Û SEY RIZA

“... De biye, biye, wela begê mî biye

Hêfê mî yêno be Sey Uşêni

Haq zaneno reyisê Kirmanciye ...”²⁰ (25)

¹⁹ “Bişewite De-ê Laçî

Yivîsê min, derbend e

Birano, şer bikin! Ev ne şerê eşîrê ye

Şerê kurd û tirkên zalim e ...”

²⁰ “... De bû, bû, ax begê min bû

Heyfa min bi Sey Uşêni tê

Xwedê dizane reîsê kirmancîye [bû]”

III.

Li ser kuştina Bavayê kurê Seyid Rizayî, di vê zêmarê da wiha tê gotin:

BAVA

"... Vaci, vaci, Bavayê ho ser o vaci

Bavayê mî şîyo Xozat

*Cêno padişayena Kirmanci ..."*²¹ (26)

IV.

Di zêmara ku li ser kuştina Sahînê (Sahan, Şahan) (27) serokê eşîra bextîyaran da, yê ku di Komkujîya Dêrsimê da bi hovane hate kuştin û serjêkirin, wiha tê gotin (28):

SAHÎN

"... Sahînê mî ke merdo nêmerdo,

*Şikiyo tîlsimê Kirmanciye ..."*²² (29)

²¹ "Bêjim, bêjim, li ser Bavayê xwe bêjim

Bavayê min çûye Xozatê

Digire padişahîya kirmancan (kurdan) ..."

²² "... Sahînê min mirîye nemirîye

Şikîyaye tilsima kirmancîyê (kurdîtîyê) ..."

V.

Dengbêjê dêrsimî Qemo Areyiz di stranekê da ku bi zaravayê kirmancî (dimilî) ye, wiha dibêje:

... [M₁] Hatirê xo wast binû tever,

Verê çêveri de guret mî ra,

Tirkonê Anadolîye,

Des hot mordemi danê zu mordem ro,

Tey çino şeref û camêrdiye.

Mî va: "Heqo, nîka bîwiyêne

Na za çor xortê Kîrmanciye,

Ma ve sîma ra pêro dênê,

Sari bîdiyene kerdên û camêrdiye."

Mî va

"Najni, mî ra çî wazena?

*To de çîn o goni-qeyretê Kîrmanciye ..."*²³ (30)

²³ "[Min] Xatirê xwe xwast û derketim derve

Li ber deriyê dor li min girtin

Tirkên Anatolyayê

Hevdeh mirov li mirovekî didin

Şeref û camêrî li cem wan tune ne

Min got: Xwedayo!

Ji bo bikaranîna navên "kirmanc" an "Kirmancîye" yê em dê çend nimûneyan ji nivîsên hin dimilîyên din ên dêrsimî bidin:

I.

*"Wuşên Axa wayîrê mîletê Kirmanciye vi ..."*²⁴ (31)

II.

*"... Horte ra serr vêrenê ra, dewleta Tirkû qanun vezena (vejena), vana "Na ra têpiya bekçi leyê dewlet de ververê pêşmergeûnê Kirmancû pêro dê."*²⁵ (32)

III.

Nivîsa ku em li vir veguhêzin, piştra destkarî lê bûye. Ew beş wisa ye:

Niha çar xortên Kirmancîyê (Kurdistanê) li vir hebûna

Me bi we ra şer bikira

Xelkê kirin û camêrî bidîta

(...)

Min got:

Amojinê, tu ji min çi dixwazî?

Xwîn û xîreta kirmancîyê (kurdîti) bi te ra tune ye ..."

²⁴ "Wuşên Axa xwedîyê mîletê Kirmancîyê bû ..."

²⁵ "... Sal di ser ra derbas dibin, dewleta Tirkîyeyê qanûnekê derdixe, dibêje: Piştî vê, bekçî dê li hember pêşmergeyên kirmancan [kurd] li kêleka dewletê şer bikin."

*"Lawikê ma, sanikê ma ca roz ve roz bêne vind? Ca caê de namê Kirmanciye nêvejino? Ca rê caê radun de vengê ma ..."*²⁶ (33)

Piştra, teksta li jor, ji alîyê Ebubekir Pamukçuyê ku propagandaya nekurdbûna dimilîyan dike, di Kovara "Ayre" yê da hatiye weşandin. Lê di Kovara "Ayre" yê da peyva "kirmanc"ê hatiye rakirin. Bi vî awayî, dibe ku cara yekem li derveyî Tirkîyeyê, di nivîsarekê da peyva "kurd"ê (kirmanc) hatibe sansurkirin. Di Kovara Ayreyê da teksta ku hevoka bi peyva "kirmanciye" yê têkildar e û jê hatiye derxistin, wiha ye:

*"Lawikê ma, sanikê ma ça roz ve roz benê vind? Ça cayê radun de vengê ma ..."*²⁷ (34)

Dimilîyên Dêrsimê ji bo zaravayê kirmancî li şûna "kirdasî"/"kirdaskî" yê navê "kirdaşî"/"kirdaşkî" yê jî dibêjin. (di devoka Dêrsimê da hevguherîn di dengê "s" û "ş" yê da pir caran tê dîtin.) Hêjayî gotinê ye ku peyva "kirdaşî"/"kirdaşkî" yê bi awayekê balkêş ketîye tomarên Tirkîyeyê.

Di wê pirtûkê da ku der barê encamên serjimariya Tirkîyeyê ya sala 1950yî da ye (35), di beşa "nifûsa li gor zimanê zikmakî" ya bajaran da, li jêr sernavê kurdîyê sê zarava hatine rêz kirin: 1. Kürtçe/Kırmancca (di îngilîzîyê da wergera van her du peyvan wiha hatiye nivîsîn: "Kurdish and Kirmanc") 2. Kırdaşça 3. Zazaca.

²⁶ "Lawikên me, çîrokên me çima roj bi roj winda dibin? Çima li cihekî navê kirmanciye yê (kurdîti) dernakeve? Çima di radyoyan da dengê me ..."

²⁷ "Lawikên me, çîrokên me çima roj bi roj winda dibin? Çima di radyoyan da dengê me ..."

Wekî ku tê zanîn ji bilî zazakî û kurmancîyê, tu zaravayekê kurdî bi navê “kirdaşî” yê (Kirdaşça) nîne û bi taybetî li gor wê pirtûkê, eger em bajarên ku herî zêde kirdaşî li wan tê axaftin berçav bikin, rewş ronîtir dibe. Di vê lîsteyê da bajarên ku herî zêde kirdaşî li wan tê axaftin: Dêrsim, Erzirom û Erzingan in. Xuya ye ku bikaranîna navê kirdaskî yan kirdaşkîyê, di nav kurdên dimilî yên Dêrsimê da bûye egera vê cudabûnê li nik rayedarên tirkên.

Li gor heman çavkanîyê, li Dêrsimê hejmara kesên ku bi zimanê Kürtçe/Kırmancca (kurdî/kirmancî) diaxivin 54056 kes û yên ku bi zaravayê zazakî diaxivin 3529 kes e. Ev hejmar mijarê zelaltir dikan. Wekî ku tê zanîn li Dêrsimê kesên ku bi zaravayê dimilî (bi gotina pirtûkê, zaravayê zazakî) dipeyivin, ji kesên ku bi zaravayê kurmancî dipeyivin pirtir in. Lê di vê pirtûkê da tê dîtin ku hejmara kesên ku bi Kürtçe/Kırmancca (kurdî/kirmancî) diaxivin ji yên ku bi zaravayê dimilî (zazakî) diaxivin, pirtir e. Ji ber ku dimilîyên Dêrsimê xwe bi “kirmanc”ê û zaravayê xwe jî bi kirmancî/kirmanckîyê dinavînin, rewşeka bi vî rengî di serjimarîyê da derketîye pêş.

Li gor nimûneyên derbasbûyî, dîyar e ku hem dimilîyên dêrsimî, hem bi giştî kurdên ku bi kurdîya bakurî diaxivin û bi navê “kurmanc”ê tên nasîn hem jî yên ku bi kurdîya başûrî diaxivin cuda cuda xwe bi peyva “kirmanc”ê dinavînin. Nimûne, bi gelemperî kurdên ku bi navê kurmancê tên nasîn, di hin herêmên wekî Şernex, Behdînan û herêma Çîyayê Kurmênc da xwe bi navê “kirmanc”ê dinavînin. Ango ev nav ji alîyê kurdên ku di bin dagirkerîya Sûrîye, Îran, Îraq û Tirkîyeyê da ne, li herêmên cihê tê bikaranîn. Em dizanin ku

kurdên başûrê Kurdistanê ji xwe ra “kirmanc” dibêjin (36), ji zaravayê xwe ra jî “kirmancî xwarû” (kirmancîya jêrê) û ji zaravayê piranîya kurdên bakurê Kurdistanê ra ku bi navê “kurmanc”ê tên nasîn “kirmancî serû” (kurmançîya jorê) dibêjin. Di heman demê da di gelek çavkanîyên nivîskî da jî li şûna kurmançê, kirmanc hatiye nivîsîn (37). Bo nimûne, peyva kurmançê di hin tekstên Mem û Zîna Ehmedê Xanî da, bi awayê kirmanc derbas dibe. Ji alîyekê din ve peyva kirmancê jî carinan wekî “kirmac”ê carinan jî wekî “kirmaç”ê (38) tê bikaranîn. Helbestvan û dîroknasa navdar jina kurd Mestûre Xanima Erdelanî, di pirtûka xwe ya dîrokê da peyva “kirmac”ê bi kar anîye. Di heman demê da Muhemmed Emînî Gulustane di pirtûka xwe ya “Mucmelul-Tewarîxê Efşariye we Zendîye”yê da dema ku qala Silêman Paşayê Babanî dike, dibêje: “Silêman Padşay Kirmac Bebe.”²⁸ (39) Li gor Ferhengi Xalî jî di devoka erdelanî da peyva “kirmac”ê bi wataya “kirmanc”ê tê bikaranîn (40).

Herçî wataya duyem a peyva “kirmanc”ê ye, Muzaffer Erdostî di vê lêkolînê da ku li ser herêma Şemdinanê kirîye, wiha dibêje:

“Eşîr, ji qebîle û ji kirmancên ku ne endamên tu qebîleyê ne, pêk tê ... Endam, malbat û eşîrên ku ji zext û desthilatdariya mîr û serokên eşîrên din revîyane û di nav eşîreka nû da bi cih bûne, herçiqas bi eşîra nû ra bibin yek û bi demê ra bibin endamên eşîrê jî lê ji ber ku xwîna wan ne ya eşîra nû ye, wekî çîneka cuda û nizm tên hesibandin. Ji wan endam, malbat û eşîran ra kirmanç tê gotin. (nîşeya Muzaffer Erdostî: Divê

²⁸ “Silêman Paşayê Bebe yê kirmac”

mirov şaxê kirmançê (kurmanç) ku beşeka kurdan a mezin e û vê peyva kirmançê ya li vir, tev li hev neke. Li vir bi mebesta nîşankirina wan kesên ku tu têkiliya wan a xwînê bi eşîrê ra nîne, kirmanç [kirmanc] tê gotin)."

Dîsa Muzaffer Erdost, di heman lêkolîna xwe da wiha dibêje:

"Kirmanç ji bo kes, malbat an jî qebîleyên ku ji eşîra xwe vediqetin û tev li eşîreka din dibin, tê gotin. Bo nimûne, qebîleya dirîyê ya ku ji Îranê hatiye û li herêma eşîra humaroyê ya li Nerduşeyê bi cih bûye, herçiqas di nav herêma eşîra xwe da wekî qebîle tê hesibandin jî di nav eşîra humaroyê da kirmanç tê hesibandin.

Kirmançek, herçiqas wekî endamê eşîrê bê hesibandin jî ji ber ku ne xwedîyê xwîna eşîrê ye, nikare bi keça mîr an jî ya pisaxayî ra bizewice. Eger birevîne, ji eşîrê tê qewirandin, eger delîve peyda bibe, tê kuştin û malê wî jê tê standin. Ji bilî van, kirmanç nikare biçe li dîwanxaneyê rûne û beşdarî sihbetê bibe." (41)

M. van Bruinessenî, di nivîsareka xwe da ku li ser kurdên Îranê nivîsiye, peyva "kirmanc"ê wekî "kurdên ku bi cotkarîyê mijûl dibin û ne xwedî tu eşîr in" rave dike (42). Li gor heman nivîskarî, peyva "kirmanc"ê tê wataya "gundîyên kurd ên ku tebee [vebestî] ne", bo nimûne "gundîyên neeşîr ên ku di bin serdestîya eşîra gravî ya Çatakê da ne." "Herwiha ji gundîyên neeşîr ên Şernexê û derdora wê ra jî kirmanc tê gotin." Heman peyv li Başûrê "ji bo mensûbên eşîrên fatih [ên ku feth kirine]" û di nav dizeyîyan da bi giştî bi wataya "xwedî erdên biçûk ên serbixwe" tê bikaranîn (43).

Li Kurdistana Îran û Îraqê, “xelkê Mukrîyan, Soran û Sineyê (Senendec) ji xelkê gundan ra kirmanc” dibêjin (44).

Li gor Hecî Ce’ferî, peyva kirmancê li herêma Behdînanê (Badînan) bi giştî bi wataya “kurd”ê tê bikaranîn, lê hin caran jî bi wataya “reaya, xelkê çîna jêrdest”. Bo nimûne dema ku ji kesekî ra bê gotin “Ez ne kirmancê babê te me” (45) bi vê watayê ye.

Herwiha Yûsuf Zîyauddîn Paşa di ferhenga xwe ya Kurdî-Erebî da dîyar dike ku peyva “kurmanç”ê tê maneya “reaya”yê jî (46). (Mehmet Emin Bozarslanî ev ferheng wergerandibû û di sala 1978an da weşandibû. Di vê wergerê da ev maneya duyem a peyva “kurmanç”ê tune bû.) (47)

Vê mijarê bala Îsmail Beşikçi jî kişandiye. Beşikçi piştî gotina “Şêx, seyid, serokeşîr û axayên mezin, keçên xwe nadin kesên ku ew jê ra dibêjin kirmanc, ango xelkê derveyî xwe” vê mijarê wiha zelal dike.

“Kirmanç [kırmanç], tê wataya kurd. Lê çîna serdest a feodal a Rojhilatê, xwe kirmanç qebûl nake û vê têgihê ji bo gelê kurd ê çewisandî, bindest û bêrûmetkirî bi kar tîne. Ev bermayîyên îdeolojîya umetxwazî yên serdema dewleta Osmanîyê ne. Lê dema ku gelê kurd derbasî prosesa netewebûnê bibe, kirmanç dê bibe xwedî rûmet û wataya xwe ya pejoratîf winda bike. Mîna tirkmenên ku di serdema Împeratorîya Osmanîyê da biçûk dihatin dîtin, lê bi destpêkirina netewebûna gelê tirk ra bûn xwedî rûmet ...” (48)

Hin caran peyva "kurmanc"ê jî bi wataya "kirmanc"ê tê bikaranîn. Bo nimûne, li herêma Selmas û Êrmîyeyê di nav kurdan da, gundîyên xwecihî yên ku bi çandinî û cotkarîyê mijûl dibin û ne endamên tu eşîrê ne, ji wan ra "kurmanc" tê gotin (49).

Nivîsên Îhsan Nûrîyî yên der barê vê mijarê da jî ne cuda ne:

"Ewên ku ji eşîrên li herêma Şahpur û Rizaîyê yên Kurdistanê ne, xwe bi navê kurdê dinavînin û kesên din ên ku mijûlî çandinîyê ne, bi navê kurmancê. Ev kurmanc jî xwe bi kurdê bi nav dikin. Ev eşîr xwe wekî beşeka kurmanc a neteweya kurd dihesibînin lê di navbera wan û yên din da ne ji alîyê zimên ne jî ji alîyê kevneşopî û rahatinê ve tu cudahî tune ye." (50)

Şiroveyên Tewfîq Wehbî û C. J. Edmondsî jî bi vî awayî ne:

"Kirmanc: Gundîyê ku ne ji eşîrê ye lê bi kurdî diaxive." (51)

Eger em gotina "*mîr û kurmanc*"ê (52) ya ku helbestvanê kurd ê navdar Melayê Cizîrî di helbestekê da bi kar anîye, bînin bîra xwe, em ê tê bigihîjin ku peyva kurmancê berî çend sedsalan jî bi vê watayê hatîye bikaranîn.

Helbestvanê kurd ê navdar Ehmedê Xanî dema ku sedema nivîsîna Mem û Zînê ya ku di dawîya sedsala 17an da nivîsiye, dîyar dike; peyvên "ekrad" (bi erebî pirhejmarîya peyva kurdê ye) û "kurmanc"ê bi hev ra û bi heman watayê ango bi wataya kurdê bi kar tîne:

“Da xelq nebêjitin ku Ekrad
Bême'rifet in, bê esl û bunyad
Enwa'ê mîlêl xudan kitêb in
Kurmanc tenê di bê hisêb in.”

Di dawîyê da em ê bi watayeka din a peyva “kurd”ê, vê beşê bi dawî bikin. Di yek ji ferhengên farisî yên navdar “Ferhengê Mu'in”ê da peyva “kurd”ê bi wataya “şivan, xwedîyê kerîyî, koçer” (53) hatiye ravekirin. Ji alîyekê din ve, “erdnîgarînasên ereb ên Serdema Navîn peyva “kurd”ê (bi erebî pirhejmar: ekrad) (54) ji bo eşîrên koçer an jî nîvkoçer ku ne ereb ne jî tirk in, bi kar anîye ... û kêman caran koçerên erebîaxiv jî bi navê “ekrad”ê dihatin navandin.” (55)

Kurr

Hin kesên ku dibêjin dimilî ne kurd in, wekî ku belgeyeka giring bi dest xistibin, dibêjin ku kirmancên (dimilî) Dêrsimê kurmancan bi navê “kur”ê yan “qur”ê, zimanê wan jî bi “kirdasî”yê bi nav dikan.

Lê elewîyên Dêrsimê bêjeya “kurr”ê ne tenê ji bo kurmancan, lê belê ji bo kurdên sinî, çi kurmanc bin çi dimilî, bi kar tînin. Ên ku vê bêjeyê bi kar tînin, ne tenê dimilîyên dêrsimî ne, hin kurmancên elewî yên Dêrsimê û herêma Mereşê jî ji bo kurmancên sinî heman bêjeyê bi kar tînin û ev bêje ji bo biçûkdîtin û hindikdîtina sinîyên çi dimilî çi jî kurmanc tê bikaranîn. Bi vê wataya xwe peyva “kurr”ê yan jî peyva “kirro”yê ya ku di tirkîyê da ji bo kurdan bi wataya


“cahil, nezan”, wekî peyveka heqaretê tê bikaranîn, li bîra mirovî tîne (56). Peyva “kurr”ê, di forma “kuro”yê da jî tê bikaranîn. Mînak, di romana “Dersimli Memik Ağa”yê ya Haydar Işıkî da, Memîk Axa wiha dibêje:

*“Saadettin Efendi, Bertal Ağa Xormek aşiretinin reisidir. İyi bilirsən sen de. Bu aşiret şinciyelek devletten yana çıktı. Şih Said İsyani'nda Kurolara darbe vurmuştur.”*²⁹ (57)

Aşkera ye ku di Serhildana Şêx Seîdî da ne tenê kurmancan, herî kêr dimilîyên sinî jî bi qasî wan derb xwarîye.

²⁹ “Saadettin Efendî, Bertal Axa serokê eşîra xormekan e. Tu jî baş dizanî. Vê eşîrê hetanî niha piştevanîya dewletê kir. Di Serhildana Şêx Seîdî da derbeyek li kuroyan da.”

III. DIMILÎ



Ev peyv piranî ji hêla kurmancan ve tê bikaranîn û di nav kurdan da bi awayê dimilî, dimbilî yan jî dimlî tê gotin. Kemal Badıllı dinivîse ku kurmanc “*Zazalara nadiren Zaza, fakat genel olarak Dımıl*”³⁰ dibêjin (58).

Peyva “dimilî”yê di nav çavkanîyên nivîskî da wekî dunbulî (59), dunbeli, dūnbeli (60), dunbali (61), donboli, dinbilî (62), dumbuli (63), dumbeli (64), dumbili (65), dumbüli (66), dumbuli (67), dımbeli (dımbeli) (68), dimbil[i] (69) dümbüllü, dımıllı, dumuli, dumılı, dumli derdikeve pêşberî me. Em dibînin ku ev peyv di rûpelên cuda yên heman pirtûkê da (70) yan jî di werger û çapên cuda yên pirtûkekê da bi awayên cihêreng tê bikaranîn. Bo nimûne, heman peyva ku di Ansîklopedîya Îslamê da ji Şerefnameyê mîna “dumbulî”yê hêcîye veguhastin, di wergera Şerefnameyê ya bi tirkî da wekî “Dınbılı” û di wergera wê ya kurdî da “dunbulî” ye. Tê famkirin ku ev formên cihêreng bi piranî ji ber guherîn û şaşıtiyên bûyerkirina tîpên erebî ne. Ji ber ku peyva dunbulî yan jî donbolîyê bi tîpên erebî DNBLY tê nivîsîn. Ên ku vê peyvê nanasin, bi piranî wê şaş dixwînin.

Çavkanî der barê wata û koka vê peyvê da, şiroveyên cuda didin. Hin ji van şiroveyan ev in:

³⁰ “Kurmanc ji zazayan ra bi giştî dimil, kêman caran jî zaza dibêjin.”

“Diyarbakır, Genç, Kulp, çapakçur, Siverek civarı halkı ve Dersimliler kâmilten Zaza'dırlar. Zazalara Dûmbeli derler. Bunu 'Dûm-meli yani Meli'nin arkasına gelen' yahut 'Meli'nin kuyruğu' gibi bir mana ile tefsir ederler. Güya Kürtler Mil ve Zil diye iki esastan doğmuş imiş, Dûmbeli[nin] bu kaynaklardan birine tamamiyle mensup olamayan, yalnız ata cihetiyle Mil ile bir münasebeti olanlara mahsus bir ad olduğu söylenir.”³¹ (71)

Rîwayeteka din jî wiha ye:

“Mevcut rivayetlere göre, güya bir zamanlar Viranşehir Milli (Milli) aşiretine tabi olmalarından kinaye olarak Zazalara ‘Millilerin arkası, devamı, tabii’ manasına Dumilli denmiş ve zamanla bu kelime Dumuli/Dımili-Dumıl, Dımıl şekillerine girmiştir (dû, Kurmanççada arka, son, sonra, devam veya kuyruk ve tabi anlamındadır)³² (72). Herwiha li gor hin kesan jî ‘dumıl’ tê wataya ‘geniş omuzlu’³³ (73) .

³¹ “Gelê Dîyarbekir, Genç, Qulp, Çapakçur, Sêwreg û Dêrsimê bi temami zaza ye. Ji zazayan ra dibêjin dumbelî. Vê peyvê, wekî 'Dûm-meli, angî bi wataya yên ku li pişt 'Meli'yê tîn, an jî 'dûvê Melî'yê şirove dîkin. Tê gotin ku kurd jî du bingehan çêbûne; mil û zil. Navê dunbelîyê ne jî bo kesên ku bi giştî ne mensûbê yek jî van çavkanîyan e, lê jî bo kesên ku jî hêla bav û kalan ve têkilîya wan tenê bi 'Mil'ê, ra heye tê gotin.”

³² “Li gor rîwayetan, jî ber ku zaza di demekê da girêdayî eşîra milîyê (milî) ya Wêranşarê bûne, angî ‘peyrew, dewamî û yên ku pişt millîyan in’ jî zazayan ra dimilî hatîye gotin. Bi demê ra ev peyv bûye dumuli/dımili-dumıl, dımıl. (dû bi kurmançîyê tê wataya paşî, dawî, pişt, dewamî, dûv yan peyrew.)”

³³ “Milên fireh”

Ev rîwayet, bi kêmanî di destpêka sedsala me [sedsala 20î] da di nav kurdên dêrsimî da jî têrbelav bû. Mark Sykes dibêje ku serokê eşîra Milî Îbrahîm Paşa di nav kurdên dêrsimî da xwedî rûmet bû, “ew bîyanîyê yekane ye ku li Dêrsimê dikare bê parêzvan geştûguzariyê bike” piştra diyar dike ku Îbrahîm Paşayî wiha gotîye:

“Kurd berî gelek salan bûne du şax: milan û zilan. 1200 eşîrên milan hene, lê ji ber ku Xweda ji wan ne razî bû, ew çep û rast belav kirin. Hin ji van winda bûn, hin ji wan jî sax man. Ên ku xwe ji mirinê xilas kirine, wekî serokê milan rêz û qîmet ji min ra girtin.”

“Çîroka Îbrahîmî qala rewşeka berî Muhemmedî dike. Ji ber ku hin ji milan xiristîyan, hin ji wan jî êzidî ne. Li gor efsaneya milan, dibêjin em zarokên Şemî ne û ji Erebianê hatine. Lê belê zil ji rojhilatî hatine. Niha ev çîroka lêl (şêlû) di nav hemû kurdên dêrsimî da tê nasîn.” Em vê çîrokê li vir bihêlin û derbasî çîrokeka din bibin:

“Milîyên ku ji Erebianê hatine, koça xwe li ser xaka Dêrsimê danîn. Dema ku Siltan Selîmî rojavayê Kurdistanê zeft kir, wezîrê wî dît ku kurd li çîyayên Dêrsimê derbider bûne û herêma ji koçeran tijî bûye. Ji ber vê yekê wezîrî emir da ku yên dixwazin bila xaniyan ava bikin û bi cih bibin û yên ku dixwazin di çadîran da bijîn, bila konên xwe bidin hev û biçin başûrî. Hinekan xanî çêkir, fêrî tirkî bûn, jinên xwe rûpûş kirin, hinek jî revîyan lûtkeyên Dêrsimê yên negihîştbar, hin ji wan ber bi başûrî ve çûn. Serokê yên ku çûne başûrî, Îbrahîm Paşa ye” (74)

Hin nivîskar û lêkolerên bîyanî, wekî Karl Hadankî derpêş kirîye ku dimilî û goran ji alîyê kokê ve ne kurd in, ji dîndeya deylemîyan in û ji başûr û rojavayê Deryaya Xezerê hatine. Li gor van, têgiha “dimilî”yê ji ya “deylem”ê hatiye. Bo nimûne, li gor Arthur Christensenî³⁴ peyva “deylem”ê bi pevguherîna dengan (métathèse) bûye “dimlî”³⁵ (75). Hin lêkolerên kurd bê ku lê bikolin, heman nêrînan dipejirînin. Der barê van angaştan da ku wekî hîpotez hatine pêşkêşkirin û ji hêla derdorên navborî ve wekî rastîyekê tên qebûlkirin, tu palpiştên beraqilî nehatine pêşkêşkirin. Bo nimûne, kesên ku angaşt dikin ku peyva “dimilî”yê ji peyva “deylem”ê hatiye, diyar nekirine ka peyva “dunbulî”yê çi îfade dike.

³⁴ Malmîsanij, paşê di gotareka xwe da ji Arthur Christensenî wisa vediguhêze û didomîne:

“Kesên ku bi navê zazayê tên nasîn, ji xwe ra dibêjin Dimle (ev peyva metateza Dêlem e) yan jî Dimlî; dibe ku ew neviyên kolonîyeka (civat) leşkerî ya Dêlemîyan bin.” Ev peyva “dibe ku”yê (ango peyva “muhtemelen”) ya ku Christensenî veguhastiye, paşê ji alîyê gelek lêkoleran ve wekî ku rast be, hatiye qebûlkirin û bûye sedema peydabûna angaştê “dimilî ne kurd in, ji neviyên deylemîyan in û ji başûrrojawayê Deryaya Xezerê hatine.” [Û] Peyva “Deylemî”yê di encama metatezê da bûye “Dimlî”. (M. Malmîsanij, “The Kırmanjki (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues it Faces”, in H. Bozarslan, C. Gunes, & V. Yadirgi (eds), *The Cambridge History of the Kurds*, Cambridge University Press, Cambridge, 2021, r. 667) [nota wergêran]

³⁵ Malmîsanijî, paşê di gotareka xwe da wisa nivîsiye:

“... hin çavkanî diyar dikin ku peyva ‘dummel’ê (zaza) ji ‘dunbul’ê hatiye.” (M. Malmîsanij, “The Kırmanjki (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues it Faces”, in H. Bozarslan, C. Gunes, & V. Yadirgi (eds), *The Cambridge History of the Kurds*, Cambridge University Press, Cambridge, 2021, r. 667) [nota wergêran]

Bi dîtina min, peyva “dimilî”yê teşeyek ji guherîna peyvên “dunbulî”yê yan “dunbelî”yê ye. Ez bi van, gihîştim vê encamê:

1. Berî her tiştî, li hin herêmên nola Motkan û Sasonê, îro ji zazayan ra dibêjin “dimbilan” (“an”a li dawîya peyvê, paşgira pirhejmarîyê ye).

2. Peter J. A. Lerch dîyar dike ku di salên 1850yê da eşîra dumbelîyê ya li bakurê Paloyê, bi zazakî dipeyive.

3. Gelek dîroknasan nivîsîye ku li herêma Xoyê dunbulî dijîn. Di Şerefnameyê da tê dîyarkirin ku ev bi eslê xwe êzidî ne û ji herêma Cizîra Boxtanê (Cizîra Botanê) ber bi wir ve çûne. Gelo têkilîya wan bi dimilîyên îro ra çî ye?

Me berê jî dabû zanîn ku di nav çavkanîyên nivîskî da navê dinbilîyê bi awayên cuda derbas dibe. Li gor ku em dizanin, kevntirîn dîroknasê ku qala qebîleya kurd a bi navê dinbilîyê kirîye, Mes’ûdî ye. [Mes’ûdî di sala 956an da koça dawîn kirîye.] Li gor ku Arşak Poladyanî veguhastîye, Mes’ûdî nivîsîye ku qebîleya “ad-dababile”yê (dunbilî) li Sûrîyeyê dijî. (navê “ad-dababile”yê ku di pirtûka Poladyanî da derbas dibe, divê “ed-denabîle” be. Ji ber ku di erebîyê da pirhejmarîya dunbilê ne ku debabîle ye, denabîle ye.) (76)

Mecdeddîn Ye’qûb Fîrûzabadî (1329-1414) yê ku di sedsala 14an da jîyaye, di ferhenga xwe ya bi nav û deng “El-Qamûs-ul-Muhît” da ku bi zimanê erebî nivîsîye, destnîşan dike ku awayê rast ê vê peyvê dunbul e. Dunbul navê eşîreka kurdan e ku berê li derdora Mûsilê bi cih dibû (77).

Ev agahdarîya Fîrûzabadî hem ji bo dîyarkirina koka peyva dimilîyê ya îro hem jî ji bo dîyarkirina navê eşîreka kurd giring e.

Em ji veguhastina “Mesalîku'l-Ebsar Fî Memalîkî'l Esmar”ê ku yek ji kevntirîn jêderên nivîskî ye, dibînin ku ev peyv bi awayê dunbulîyê tê da derbas dibe. Fedlulah Îbnu'l-'Umerî Şehabuddîn Ehmed (1301-1349) di vê pirtûka xwe da nivîsiye ku dunbulî li Çîyayê Meqlûb û Muxtarê (Meqlûb û Muxtar) yên bakurê rojhilatê Mûsilê dijîn (78).

Bi giştî kurdbûna dunbulîyan tê qebûlkirin. Wekî mînak mîrekê ku ji vê xanedanê bû û di sala 995an da wefat kir, bi navê Emîr Suleyman Kurd tê nasîn. Li gor çavkanîyên dîrokî, yek ji mîrên heman xanedanê Emîr Ehmed Beg (dîroka mirinê: 1472) xwedîyê dîwaneka kurdî bû ku ew dîwan di nav kurdan da bi qasî dîwana Hafîz Şîrazîyî hêja bû. Herwiha Ehmed Begî xezelên Hafîzî bi pêncrêzî kiribûn kurdî. Li gor veguhastina Papazyani, Ristem Xanê kurê Ehmedê Xan El-Dunbulî ku yek ji kurdên dunbulî ye, di “Îşaratu'l-Mezahib” û “Îşaratu'l-Edyan”ê da û Evdirezaq Îbn Necef Qulî Xanê Dunbulî sala 1850yî di “Tarîxê Denabîl”ê (Dîroka Dunbulîyan) da nivîsiye ku dunbulî kurdên ji mezheba şîayê ne.

Di beşekê da ku Basile Nikitine ji destnivîsekê vediguhêze, dide dîyarkirin ku dunbulî (donbolî) navê xwe ji Keleha “Dunbul”yê (Donbol) girtiye. Hin caran behsa vê kelehê wekî keleheka li herêma çîyayî ya Dîyarbekirê tê kirin, hin caran qeraxa Çemê Firatê û hin caran keleheka ku tirk dibêjin

Qerecehîsar lê bi navê Dunbulê (Donbol) navdar e (79), herwiha hin caran wekî “keleheka di navenda Kurdistanê da ye” qala wê dibe (80). Em li vir bidin dîyarkirin ku navê “Dîyar-i Bekr”ê yan “Dîyarbekîr”, berî ku bibe navê bajarê ku îro bi tirkîyê jê ra dibêjin Diyarbakır (81), navê herêma Dicleya Jorîn bû. Bo nimûne li gor çavkanîyeka din a farisî ku di nivê sedsala 19an da hatîye nivîsîn, li rojhilatê wîlayeta Dîyarbekirê Ermenistana Mezin û Kurdistan, li rojavayê wê Ermenistana Biçûk û Mulkê Şam, li bakurê wê Anatolya û Erzingan û li başûrê wê jî axa Erebian û Şamê hebûn (82). Senceqên ku di nav salên 1868-1885an da girêdayî bajarê Dîyarbekirê bûn ev bûn: 1) Dîyarbekir (Sêwreg, Madera Erxenîyê, Resuleyn, Licê, Silîvan, navend ango Amîd) 2) Mamûretulezîz 3) Meletî 4) Sêrt 5) Mêrdîn (83). Tê famkirin ku peyva Dîyarbekirê ya ku di teksta farisî da tê qalkirin, di wataya wîlayeta Dîyarbekira kevn da hatîye bikaranîn. Bi rastî jî dimilî îro li vê herêma navborî dijîn.

Elî Ekber Dêhxuda jî der barê keleha Dunbulîyê da agahdarîyeka bi vî awayî dide:

“Dunbul, navê çîyayekê herêma Dîyarbekirê ye. Serokên Dunbulî yên Azerbeycanê bi koka xwe ji vê herêmê ne û wekî dummel/zaza navdar in” (84).

Hin çavkanîyan jî dîyar kirîye ku Keleha Dunbulîyê (Dunbul) li ser Çîyayê Senciranê ye (85). “Çîyayê Senciranê” bi ihtimaleka mezin Çîyayê Sincarê ye ku kurd jê ra Şingar an Şengal dibêjin û êzidî lê dijîn.

Di gel nerazîbûna hin nivîskarên ku dibêjin dimilî ne kurd in, ev agahdarî têkilîya dunbulîyên li herêma Xoyê ya di nav tixûbên Îranê da û dimilîyên bakurê Kurdistanê nîşanî me didin.

Herçend mijara dema hatina dimilîyan li bakurrojavayê Kurdistanê ku îro lê dijîn, hîn jî cihê nîqaşê be, ev agahdarîyên ku me ji Îshak Sunguroğluyî veguhastine, ji du alîyan ve giring in; a yekem dibêje dimilîyên Dêrsimê, bi gotina wî dinbilîyên Dêrsimê, ew kurd in ku ji Îraqê koçî Dêrsimê kirine, ya duyem jî bi nîşandayîna navê cih û kesan diyarkirina belavbûna elewîtîyê di nav dimilîyên Dêrsimê da ye.

Sunguroğlu wiha dinivîse:

“Şah İsmail ise, zaptettiği bölgelerde emniyeti temin etmek için kendi tebaasından olan Dinbilli aşiretini tedibe girişince etrafında bulunan bütün Irak Kürtleri korkularından batıya doğru kaçmağa başlamışlar ve gelip Van, Bitlis, Diyarbekir, Harput gibi dağlık bölgelerine yayılmışlar ve bunlardan bir kısmı bilhassa sarp dağlara ve vahşi meşe ormanlarına sahip ve aynı zamanda yol uğrağı da olmayan Dersim'i bir yurd olarak seçmişler ve buraya yerleşmişlerdi.”

“... [Şah İsmail] Bu cümleden olarak Rumyeli Nur Ali Halife namında bir Kızılbaş şeyhini de Çemişgezeğe göndermişti. O zaman Çemişgezek emiri bulunan Hacı Rüstem, Nur Ali'yi memlekete sokmıyacağı ve karşı koyacağı yerde, bilâkis şehri bu halifeye terk ile savuşup Şah İsmail'in yanına gitmişti ...

Nur Ali uzun zaman Çemişgezek'te kaldı, Çemişgezek ve Dersim'de durmadan çalışarak Şüliği halka aşıladi, bu tohumlar, yerli halk ile Dersim'e yerleşen Irak Kürtleri

*arasında bir mezhep farkı ve dolayısıyla çetin bir düşmanlık meydana getirdi, ardı arası kesilmeyen Dersim isyanları işte bu tarihten sonra başlamıştır...*³⁶ (86)

Hin çavkanî dîyar dîkin ku dunbulî berê ji mezheba şafîî bûn (87).

Pêwîst e were zanîn, dibe ku hemû dimilî ne bi hev ra lê di demên cuda da hatibin vê herêma ku niha lê dijîn.

4. “nb”ya ku di peyva dunbulîyê da ye, ji ber bilêvkirina hêsan bi demê ra destpêkê bûye “mb” piştra bûye “m” û awayê peyva dimbilî û dimilîyê (dumulî) standîye. Di kurdîyê da gelek mînak li ser guherîna “nb”yê ber bi “mb”yê ve û piştra ber bi “m”yê ve hene. Li vir em hin nimûneyên van guherînan dinivîsin:

³⁶ ... ji bo ku Şah İsmail ewlehîyê li herêmên ku zeft kirine bisepîne, eşîra dimilîyê ku li jêr destê wî ye haydar kir, bi vê haydarkirinê kurdên Îraqê yên li derdora wî, hemûyan ji tirsan ber bi rojavayî ve dest bi revê kir û hatin li herêmên çîyayî yên wekî Wan, Bedlîs, Dîyarbekir û Xarpêtê belav bûn. Beşeke ji van jî Dêrsim ji xwe ra mîna welat hilbijart û li Dêrsimê bi taybet li çîyayên asê û li daristanên berûyan ên bêşop bi cih bû.

“... [Şah İsmailî] şêxekê kizilbaş bi navê Xalîfe Nûr Elî ji Rûmyeyê şand Çemişgezekê. Hecî Ristemê ku wê demê fermandarê Çemişgezekê bû, li şûna ku nehêle ew bikeve bajarî û li beranber wî bisekine, bajar ji Xelîfeyî ra hişt û çû cem Şah İsmailî. Nûr Elî demeka dirêj li Çemişgezekê ma, li Çemişgezek û Dêrsimê bê navber xebitî û şîitî di nav civakê da belav kir. Ev tov di nav civaka xwecihî û kurdên îraqî da yên ku li Dêrsimê bi cih bûne, bû egera cudahîya mezheban û dijminîyeka tund. Serhildanên dêrsimî yên ku dawîya wan nayê, di vê demê da dest pê kirin ...”

Di zaravayê dimilî da			Wataya bi kurmancîyê
NB	MB	M	
Şenbe	Sembe	Şeme	Şembî, şemî
Sinbore	Simbore, sembûre	Simore	Simbore, simore, sibore, sivorî
Misk û enber	Misk û ember	Misk û emer	Misk û enber, misk û ember
Tenbel	Tembel	Temel	Tembel, tenbel
Enbaz	Embaz	Emaz	Heval
Tenbîh	Tembê	Temê	Tenbî, tembî, temî

Di şerefnameyê da di beşa li ser begên dinbilî da, tê dîyarkirin ku dinbilî ji wîlayeta Boxtanê (Botanê) çûne herêma Xoyê û li wir bi cih bûne. Destpêkê ew jî êzidî bûn û di nav kurdan da ji wan ra “dinbilî boxt”ê dihat gotin. Îro jî gundekê girêdayî Cizîra Botan bi navê “Dunbilya”yê heye. (di nav hin çavkanîyan da ev gund bi navê “Dumbulya yan Dimilya”yê derbas dibe û bi tirkî navê wê kirine Erdem.) Herwiha niştəcihên gundê “Botîyan”ê yê girêdayî navçeya Dara Hênîyê û eşîra ku bi heman navî ye, bi zaravayê dimilî dipeyivin û hîn jî navê Botîyan (Botîyon) diparêzin.

Ji çavkanîyeka farisî ku di nivê sedsala 19an da hatîye nivîsîn, em fêr dibin ku dunbelî (dunbilî) kurdên qizilbaş in, lê belê êdî bi zimanê tirkî dipeyivin:

“Dunbelî ... îro qebîleyeka kurdî ye ku ji bawerîya kizilbaşî ye. Hemû bi tirkîyê dipeyivin û ji şîaya îmamîyeyê ne. Li bajarê Xoyê dijîn ...” (88)

Dîroknas Muhemed Cemîl Bendî Rojbeyanî nivîsîye ku ev dunbulîyên Xoyê, herçiqas îro bi tirkîyê dipeyivin jî berê bi zaravayê goranî dipeyivîn (89).

Îro, çavkanîyên kurdî û Îranê derfetê didin ku em nivîskar û helbestvanên kurdên dunbulî yên ku li herêma Xoyê û Azerbeycanê dijîn, binasin (90). Navgîna weşanê ya bi navê Nîştîman, a Komeley Jîyanewey Kurd a ku li Mehabadê ava bûye, Heyran Xanim wekî helbestvana jin a kurd nasandîye (91).

Dimilî wekî navê cih û eşîrê

Îro, em li herêmên cuda yên Kurdistanê rastî hin navên gundan û navên hin eşîrên êzidiyan tên ku ev nav navê dimilî/dumilîyê tînin bîra mirovî. Ji van navan ên ku zêdetir di nav çavkanîyên nivîskî da hatine tesbîtîkirin, ev in:

1. Gundê Dumulyanê [Dimilyan] yê girêdayî navçeya Pasûrê (Qulpê) ya Dîyarbekirê.

2. Gundê Dimilîyê yê girêdayî bajarokê Germilîyê yê navçeya Çemişgezekê.

3. Gundê Dunbilyayê (Dumbulya, Dimilya) yê girêdayî navçeya Cizîrê.

Navê vî gundî di çavkanîyên nivîskî da wekî Dunbilya, Dumbulya, Dîmilya derbas dibe ku ev jî guherîna “nb-mb-m” yê nîşan dide.

4. Gundê Dimlag/Dimlekê yê girêdayî navçeya Kîxîyê ya Çewlîgê.

5. Abowîan, di sala 1848an da qala gundekê bi navê Dimbelîyê (Dumbelî) yê bi ser Palîyê ve, dike (92).

6. Îro, li Efrînê, li herêma Çîyayê Kurmênc ku di nav tixûbên Sûrîyeyê da ye, gundekê bi navê Dumulîya ku girêdayî navçeya Recoyê ye, heye. Navê resmî yê vî gundî Dumbullî ye û xelkê wî bi kurmancî dipeyivin.

7. Li Îranê, li herêma Hervabadê bi navê Donbolî û li herêma Ehrê jî bi navê Dumulî (Dumulû) gundên şîa hene.

8. Hin çavkanîyên tirkên dîyar dikin ku têkilîya dimilîyên (zaza) Çolemerikê û Çanmerikên Bongilanê (Suelexûnê) bi eşîra dumbulanê ya Hezroya girêdayî Dîyarbekirê û Çaymaza Mêrdînê ra heye (93).

9. Yûsif Zîyauddîn Paşa, dinivîse ku dinbilan yek ji eşîrên Şîrvanê ye (94).

10. Li Kurdistana Îraqê, eşîra dumilî ku yek ji eşîrên êzidîyan e (95) li hin gundên herêma Şêxanê ya ku di navbera Dihok û Çîyayê Meqlubê da ye, dijî. Di nav hin çavkanîyan da navê vê eşîrê wekî "domilî" derbas dibe. Navê eşîra dumbelîyê ya êzidî ku di berhema J. Campanileyî ku di sala 1818an da hatiye weşandin, derbas dibe; yan heman eşîr e yan jî beşek ji wê eşîrê ye. Li ser vê yekê, em dikarin bibêjin ku berê navê vê eşîrê dumbelî bû, piştra awayê dumilîyê (yan jî domilî) girtiye (96).

Bi vê boneyê, em ê bi mînakekê bi bîr bixin ku îro navên hin eşîrên êzidî li hin wargehên dimilîyan (zaza) hatine kirin; bo nimûne gundekê bi navê Qizilan (Qizlan) girêdayî navçeya Gêlê heye. Niştecihên vî gundî bi zaravayê dimilî dipeyivin. Em ji ferhenga “Hediyye'l-Hemidiyye Fi'l-Luxeti'l-Kurdiyye”yê ku di sala 1894an da hatiye weşandin, dizanin ku “qizilan” (97) navê eşîreka êzidîyan e.

Manendîyên bawerî û kevneşopîyên di nav êzidî û dimilîyan da

Hin dîyardeyên din jî hene ku têkilîya êzidî û dimilîyan dîyar dikin. Bo nimûne, balkêş e ku hin tradîsyon û adetên ku hîn jî di nav dimilîyan da, bi taybetî jî di nav dimilîyên elewî da tên dîtîn, pir dişibin ên êzidîyan. (herçiqas di nav hin çavkanîyan da li şûna navê “elewî”yê, navê “qizilbaş” hatibe bikaranîn jî em ê bi gelemperî navê elewîyê bi kar bînin.)

Li gor ku em dizanin, danberhevkirina elewîyên kurd û êzidîyan ji hêla bawerî û kiryanan ve nehatîye kirin. Ev mijar bi tena serê xwe mijara lêkolîneka taybet e û bi qasî ku em dizanin heta îro ev mijar nehatîye vekolan. Ji bo ku mijar zelaltir bibe, em ê li vir tenê çend xalan bi bîr bixin. Ji bo ku em rê li ber şaşfamkirinê bigirin, dê baş be eger em van xalan zelal bikin: Elewîtiya ku li jêr em manendîyên wê bi êzidîtiyê ra nîşan dikin, ne tenê bi elewîtiya dimilîyên (kirmanc) Dêrsimê ra sînordar e; hin ji van manendîyan ji bo elewîyên ku ne kurd in jî hene (98).

1. Manendî di navbera pîrozkirina “Cemayî” ya êzidîyan û Cejna Rojê Zîyarê (99) da hene ku her sal nivê meha gulanê li herêma Pîranê li nav dimilîyên sinî yên li ser mezheba şafîî tê pîrozkirin (100).

2. Giringîya ku êzidî û dimilî bi taybet jî dimilîyên elewî yên dêrsimî didin rojê.

“Êzidîyê ku nimêj bike, gava roj hiltê yan diçe ava, berê xwe dide rojê û sê caran çok dide erdê ... diayên êzidîyan çar in.

- Diaya sibehê: Diayeka dirêj e û bi zimanê kurdî û erebî têkilî hev e.

- Diaya evgerê: Ev dia ji ya din dirêjtir e û dîsa sibehan tê xwendin.

- Diaya dema ku roj diçe: Ev dia ji 53 diayan pêk tê û jê ra diaya rojê jî tê gotin. Dema ku roj diçe ava ev dia tê xwendin.

- Diaya êvarê: Ji vê diayê ra diaya şehadetê jî tê gotin. Dema ku mirov dikeve nivînan, tê xwendin ... Nerîna şaş a ku dibêje êzidî ji roj û heyvê ra îbadetê dikin, encama vê yekê ye ku êzidî Xwedayê Mezin (Tawûsê Melek) wekî ‘efendîyê heyv û tarîtiyê’ û ‘efendîyê roj û ronahiye’ nîşan didin.” (101)

Êzidî, “Herwiha sibehê tîrêjên rojê li ku derê bidin, wê derê maç dikin.” (102)

Di nav dêrsimîyan da, “ferz bû li ser her dêrsimîyekê ku dema êvarê bikeve nivînên xwe û serê sibê rabe û serê xwe bişo ji “Xodê” ra dia bike. Dêrsimî serê sibê pir zû radibin û li

hember tîrêjên rojê yên ku ji nav çîyayên biheybet derdikevin, bi bedena xwe bi liv û tevgerên cur bi cur îbadetê dîkin. Ji rojê ra Ronahîya Xwedê tê gotin.” (103)

Dimilîyên dêrsimî yên elewî, ji rojê ra “bimbarek” an jî “Roştîya Mehemed-Elî”³⁷; ji heyvê ra jî “Roştîya Ana Fatma”³⁸ dibêjin. Dema ku roj hiltê û diçe ava, jê ra (104) dia dîkin (105). Wekî ku em di vê stranê da dibînin, di hin stranên dêrsimî da ku bi zaravayê kirmancî (dimilî) têne gotin, roj wekî “Mehemed” (Mihemed) an “Mehemed-Oli” (Mihemed-Elî) hatiye binavkirin:

“Biko, sipede ra Mehemed vejîyo

*Na Mehemed-Oli yo ...”*³⁹ (106)

“Li gor bawerîya civaka Dêrsimê, sibeh dema îbadetê ye ... dema xêr û bereketê ye ...

Dibêjin ku: Xweda serê sibehê zû li umeta xwe dinêre ka kî zû ji xew radibe û ji wî ra diayan dike û piştra diçe ser karî. Ew umeta xwe li gor şîyarbûna zû rêz dike. Ên ku zû ji xew radibin, rizqê wan bi çemçikê, yên ku paşê radibin bi mistê û yên ku pir dereng radibin jî bi kevçîyê dide ... dema sibehê pir meqbûl e ... Peristina sibehê pir pir meqbûl e” (107). Hin dengbêjên Dêrsimê, di helbestên xwe da cih daye vê mijarê (108).

³⁷ “Ronahîya Dayê Fatîma”

³⁸ “Ronahîya Mehemed-Elî”

³⁹ “Lawo, ji sipêdeyê ve Mihemed derketîye

Ev Mihemed Elî ye ...”

Yek ji nivîskarên dêrsimî Munzur Çem jî di nivîseka xwe da behsa vê mijarê dike:

“Alevî Kûrtlerde ateş, güneş ve ay kutsal olarak bilinirler ...

... Güneş tanrıya yakın düzeyde kutsallığa sahiptir. O nedenle de birtakım zorunlu haller dışında, kurban mutlaka güneş doğarken ve ona çevrilerek kesilir. Ay, aynı şekilde kutsal olmakla birlikte güneşten bir derece daha aşağıda yer alır. Güneş ve ay doğarken, yüz onlara çevrilir, eller açılır ve dua edilir. Güneşe, ayrıca hastalık ve öteki sıkıntı anlarında da yalvarılır, dua edilir. Dua, güneşin ve ayın adını anarak onlara yalvarma biçimindedir”⁴⁰ (109).

Elewîyên dêrsimî, ewqas nîrx didin rojê ku carinan ji bo ku nexweşan baş bike jî, jê lava dîkin (110).

Li hin herêmên derveyî Dêrsimê jî tê dîtin ku dimilî rojê pîroz dibînin û pê sond dixwin. Mînak, li herêma Pîran û Gêlê di jîyana rojane da gelek çaran bi “Ino roj mî kor ko (bîko)!” angî [eger ez derewan dîkim] “bîla ev roj min kor bike” sond tê xwarin.

3. Rêzgirtina ji Xizirî ra di nav êzidî û dimilîyan da

Li gor ku M. Nûrî Dêrsimî nivîsîye, duyem cejna giring a dêrsimîyan cejna “Xidir Ilyas”ê ye. “Ocak ayının sonunda üç gün oruç tutulur. Bu üç gün zarfında bazı kızlar su içmezler

⁴⁰ “Di nav kurdên elewî da agir, roj û heyv pîroz in ...

... roj di asta pîrozîya Xwedayî da ye. Loma ji bilî hin rewşên ferzkirî, qurban hertim di hilhatina rojê da û ber bi alîyê wê ve tê serjêkirin. Heyv jî bi heman awayî pîroz e, lê pîrozîya wê astekê ji ya rojê kêmtir e. Dema ku roj û heyv hiltên, berê xwe didin wan, destên xwe rabêrî jor û dest bi diayan dîkin. Herwiha di demên nexweşî û zehmetîyê da jî lava ji rojê dîkin.”

ve rüyalarında kendilerine su verecek olan gencin kendilerine nişanlanacağına ve eş olacağına inanırlar. Oruçtan sonra, kavut dedikleri kavrulmuş buğdaydan yapılmış unu, bir kap içerisinde en yüksek yukluk üzerine koyarak etrafına mumlar yakarlar ve gece Hazreti Hızır'ın bir işaretini beklerler. Ertesi günü" sözü geçen kavut, yağ ve balda pişirilerek komşulara dağıtılır, sofralar çekilerek düğün bayram edilir"⁴¹ (111)

Munzur Çem jî behsa heman mijarê dike:

"... Hızır'ın Alevi inancında çok önemli bir yeri olduğunu belirtmek gerekir. Bu inanca göre, ... Hızır aksakallı bir ihtiyardır. Boz bir atın sırtında gezer. O, 'cantêzık' (tezcanlı) tır. Öylesine sır sahibidir ki her an her yerde hazır haldedir. O nedenle de dara düşüldüğünde hemen hemen her zaman ilk olarak ona seslenilir"⁴² (112)

Helbestvanê dêrsimî Wuşenê Tikmeyî (1911-1986) di helbesteka (deyîş) xwe da li ser Xizirî wiha dibêje:

⁴¹ "Di dawîya meha kanûna paşîn da sê rojan rojî tê girtin. Hin keçik di van sê rojan da avê venaxwin û di wê bawerîyê da ne ku xortê ku di xewna wan da a' bide wan, ew dê bibe destgirtî û hevserê wan. Piştî rojîyê 'qawit'a k' ji ardê genimê qelandî çêdikin, di tasekê da li ser cihê herî bilind ê k' binê bi cih dikan. Li dora wê, fîndan pê dixin û bi şev li benda nîşana fîezretê Xidirî dimînin. Roja din wê qawitê di nav zeyt û hingivî da dipêjin, li cîranan belav dikan, sifre tîn raxistin û dawet û cejn tîn lidarxistin."

⁴² "... divê bê dîyarkirin ku di bawerîya elewîtiyê da Xizir xwedî cihekê pir giring e. Li gor vê bawerîyê, Xizir kalekê rihspî ye. Li ser piştê hespekê gewr digere. Ew xwînsivik e. Xwedî razeka wiha ye ku her dem li her derê ye. Loma, dema mirov tûşî tengasîyan dibe, berî her kesî hawara xwe di-gihîne Xizirî."

“Çıqa kokım o, cansenik o, Kal Xızır o

Koti veng dê hem hazır o hem nazır o.”⁴³ (113)

Wekî li herêma Gêl û Pîranê, di nav dimilîyên herêmên din da jî piştî Sersalê ango 13ê kanûna paşîn, di roja Xiz Îlyasê (Xîz Lîyas, Xed Îlas) da “qawiti” (qawit) tê amadekirin û li malê, di kulînê (kîlerê) da, li cihekê bilind ku destê zarokan negihîjîyê, tê danîn. Şevêkê li wir tê hiştin û sibehê tê xwarin. Wisa tê bawerkirin ku Xoca Xizir dê wê şevê were û destê xwe bide qawita amadekirî, ev jî dê şens û xêrê bi xwe ra bîne.

Êzidiyên Şengalê jî di pêncşema yekem a meha sibatê da Cejna Xidir Îlyasê pîroz dîkin û berî wê jî sê rojan rojî digirin. Hin hene li şûna sê rojan, rojekê rojî digirin. Wekî dimilîyan, êzidiyên Şengalê jî di roja Xidir Îlyasê da qawitê amade dîkin û belavî nas û xizmên xwe dîkin (114). Divê bê dîyarkirin ku li gor bawerîya hin lêkoleran, ev cejn ji cejneka ku ji alîyê xiristîyanan ve tê pîrozkirin, hatîye.

4. Li gor hin çavkanîyan di 21 an 22yê meha adarê (115) da elewîyên din cejnêkê pîroz dîkin, di nav dêrsimîyan da Neweroze (Newrûz) yan Cejna Sultan Newruzê (116) û di nav êzidiyan da Cejna Sersalê (117) heye.

5. Em dizanin ku di nav êzidîtiyê da hîn çîn û sinifên olî hene û ne gengaz e ku mirov ji yekê derbasî yeka din bibe; ev awayekê sîstema kastê ye. Herçend ne ewqas peyt be jî di nav elewîyên Dêrsimê da em nîşaneyên hin bermahîyên vê

⁴³ “Çiqas kal e, xwînsivik e Xizirê Kal e

Li ku derê bang lê bikin, li wir amade ye.”

sîstemê dibînin. Mînak, herçend ne hertim be jî “Pîr û rêber bi piranî kurêşanî ne ... kesên ku ji pîr û rêberan ra pîrtîyê dîkin ji eşîrên cuda ne. Mînak, eşîrên sêydan (sêydu), axuçan (axuçanû), bava mansurîyan (bava mensurû), dewrêş cemalan (dewrêş cemalû) di vê rewşê da ne ... eger kesek ji van eşîran bi awayekê pratîk mîna dede, rêber an murşîd kar bike yan jî neke, tê qebulkirin ku ji kesên normal taybetmendîyeka wî ya cuda, kesayeteka wî ya pîroz heye. Wiha tê bawerkirin ku ev taybetmendî ji aliyê Xwedayî ve ji bo van eşîr an malbatan hatiye dayîn. Diçin destên wan û rêzê ji wan ra digirin ...” (118)

6. Balkêş e ku nasnavên olî yên wekî “Baba şêx (îxtîyar)”, “Pîr”, “Sultan” yên ku li nav êzidîyan peyda dibin, di nav elewîyên dêrsimî da jî hene. Mînak, di nav ewlîyayên dêrsimî da gelek “Bava”, “Kal (îxtîyar)” û “Sultan” hene, wekî : Tuzik Bava, Kalo Sipê, Kal Ferat, Kal Mem, Sultan Tehirê Serê Baxira Sipiye, Sultan Seyd (119).

7. Manendîyên mezin di nav pratîkkirina “misayîvênî” (musahîbî) ya elewîyên Dêrsimê û hîlbijartina mecbûrî ya “birayê axiret” ya êzidîyan da hene (120). Jixwe dimilîyên Dêrsimê jî ji bo “misayîv”ê dibêjin “birayê axretê”.

8. Tê zanîn ku hem êzidî hem jî elewî hin lawiran pîroz dibînin an jî goştê hin lawiran naxwin.

Bo nimûne, di êzidîtîyê da xwarina goştê gakovîyê (mambiz) qedexe ye. Goştê dîkî jî li şêx û mirîdên êzidîyan heram e (121).

Ji bo elewîyan, gakovî “yek ji lawirên pêroz e û nayê kuştin ... dîk tê xemilandin.” (122) Elewîyên Dêrsimê nêçîra ahûyan wekî gunehekê mezin dibînin.

9. Hem êzidî hem jî elewî gelek qîmetê didin rih û simbêlan.

Êzidî qîmetê didin por, rih û simbêlan, tew qîmetê didin tevaya mûyên rû û serî. Ji ber vê yekê, “tirkan ji ber dirêjkirina porê wan, porê wan ê ku dikeve ser mijang û lêvên wan û mûyên ku ji guh û firnikên wan derdikevin, leqeba saçlı (bipor) û sekiz bıyıklı (heştimbêl) li wan kirîye.” Li cem wan “tiraş bûn, kurkirina simbêlan, bikaranîna şeh û gûzana yekê din” ji aliyê kevneşopîyê ve qedexe ne (123).

Li gor hin çavkanîyan, elewî (qizilbaş) “rih û simbêlên xwe kur nakin” (124). Wiha dixuye ku îro di nav elewîyan da adeta (nerît) kurnekirina simbêlan hîn heye.

Xuya ye ku bi giştî li cem kurdan por binirx e. Bo nimûne, li bal kurdên sinî, avêtin an jî şewitandina porî, kiryareka nelirê ye. Porê qusandî tê komkirin û bi gelemperî li cihekê bilind, qulên dîwêr û hwd tê bicihkirin. Dibe ku di vê tevgerê da bi qasî xemxurîya paqijîyê, bandora nerît û olên kevnar hebe.

Tê zanîn ku mêrên êzidî porê xwe dirêj dikin. Em bi bîr binin ku berê li Dêrsimê hin seyid û dedeyên elewî û hin şêxên sinî-neqîşebendî yên li hin herêmên mîna Pîranê, porên xwe dirêj dikirin.

10. Di êzidîtiyê û elewîtiyê da cezayekê wekî afarozkirinê didin kesên ku qaydeyên heyî bin pê dikin. Êzidîyê ku bi vî cezayê giran “tehrîm” bûye (heram bûye), bi gotineka din,

lanet lê hatîye kirin, “hemû mafên xwe winda dike, tew jin û zarokên wî jî wî red dikin. Eger kesê ku hatibe lanetkirin şêxek be, riha wî tê kurkirin û menfûr (kesê ku jê nefret dikin) tê îlankirin. Wî şêxî dibin ser tirba Şêx Adîyî, ebaya wî jê tê standin û mal û milkê wî tê desteserkirin.” Tew êzidîyên ku wî dihewînin jî heman cezayî dixwin (125).

Di nav elewîyan da îzolekirina kesan ji civakê wekî “duşkunî” (ketinî) tê zanîn. Ev “ketinî” li cem elewîyên Dêrsimê bi gotina zaravayê dimilî wisa tê binavkirin: “Verê çêver de kemere ronayene”⁴⁴ yan jî “Nolêta Kurêş weardene”.⁴⁵ (126) Kesên ku vî cezayî dixwin *“aile ile her türden ilişkiler kesilir. Onlara selam verilmez, hayvanları köyünkinden ayırdedilir, yüzleri tıraş edilmez, niyaz veya kurbandan kendilerine pay verilmez ve onlardan bu tür adaklar alınmaz, ölüleri olduğu zaman cenazeye gidilmez”*⁴⁶. Ji zanyarîyên nivîsa Munzur Çemî tê zanîn ku ne tenê kesê ku ev sûc kirîye, herwiha malbata wî jî tê cezakirin û tişteke balkêş e ku ev ceza ji bo merivên kesê cezakirî ye jî.

11. “Ji bo ku mirov bibe êzidî, divê ji dayikbûnê ve, êzidî be.” (127) Heman tişt ji bo elewîtiyê (qizilbaşî) jî derbas dibe. Her kesê ku dixwaze, nikare bibe elewî. Li gor nivîsa

⁴⁴ “Danîna kevirî li ber derîyî”

⁴⁵ “Laneta Kurêş lê anîn”

⁴⁶ “Hemû têkilîyên wan ji malbatê qut dibin. Silav li wan nayê kirin, lawirên wan ji yên gundîyan tên veqetandin, rûyê wan nayê kurkirin, para wan ji nîyaz û qurbanan tune ye û nidirên wan nayên girtin, dema ku mirîyên wan hebin, kes naçe sersaxîyê.”

Abdûlbaki Gölpınarlıyî, *"Kızıl-baş, erkek olsun, kadın olsun, mutlaka Kızıl-baş soyundan gelir"*⁴⁷ (128)

12. Di qizilbaşan da berdana jinê heram e (129). Di nav êzidîyan da jî berdana jinê kê m e.

13. Veşartina ola xwe ("teqîye" li cem elewîyan).

Xaleka din li ser nêzîkbûna kurdên êzidî û kurdên Dêrsimê bala Mark Sykesî jî kişandîye û wî nivîsîye ku êzidîyên Şengalê û kurdên Dêrsimê ji alîyê fîzîkî ve jî dişîbin hev:

"Ji alîyê fîzîkî ve êzidîyên Şengalê dişîbin kurdên Dêrsimê: hestîyên biçûk, bejnzirav, zeîf, çavbirçî, xwedî rûyekê eşdar, pozê biçûk ê hilawestî, çeneya tûj, çeneya jêrîn a fireh, rûyekê bi hestîyên derketî yê rûyî, çavreş û gujmikzirav. Ev kes porê xwe bi şeş an heft gulîyan dihûnin û ji alîyekê rûyê xwe ve berdidin." (130)


M. Şerif Fîratî yê ku bi hevkarîya xwe ya bi tirkên ra navdar e, dinivîse ku zaza bi navê dumbelî û êzidî hatine navandin (131).

Manendîyên rêzimanî yê di navbera zaravayê dimilî û kurmançîya herêma Behdînanê da jî dibe ku şopên vê rastîyê bin ku dimilî berê li van herêman jîyane. Tevî ku di gelek devokên kurmançî da hin formên rêzimanî wekî formên tewandî yê navdêran û yê îzafeya navdêrî û rengdêrî wînda bûne jî di kurmançîya behdînî û dimilî da hîn zindî ne. Ev manendîyên zimanî jî hêjayî lêkolînên kûr in. Bê ku em bikevin nav hûrgilîyan, em ê li vir çend mînakên bidin.


⁴⁷ "Kesê qizilbaş, çi jin çi zilam be, ji koka qizilbaşê tê."

Zaravayê kurmancî	Zaravayê dimilî
a) Lawê muxtêr	a) -
b) Lawê muxtarî	b) Lajê muxtarî/layê muxtarî
a) Bêrîya welêt	a) -
b) Bêrîya welatî	b) Bêrîya welatî
a) Min sêv da lêwik.	a) -
b) Min sêv da lawikî.	b) Mi say day lajekî (layikî).
a) Ji Kemêl ra bibêje.	a) -
b) Ji Kemalî ra bêje.	b) Kemalî ra vaje.
a) Ehmed nan xwar.	a) -
b) Ehmedî nan xwar.	b) Ehmedî nan ward (werd).

Herçiqas ew formên “a”yê yên ku di mînakên jorîn da hatine pêşkêşkirin îro di kurmancîyê da pir tîn bikaranîn jî formên “b”yê li Hekarî, Behdînan û herêmên nêzî wan tîn bikaranîn. Wekî ku tê dîtin, forma ku di zaravayê dimilî da tê bikaranîn, mîna forma “b”yê ya kurmancî ye. Helbet di ziman û kevneşopîyan da manendîyên navborî ne tesaduf in.



IV. ZAZA



Der barê navê “zaza”yê da şiroveyên cuda hatine kirin. Dibe ku ji ber bilêvkirina hêsan û biahengîbûna wî, ew nav li gor navên “dimilî” û “kird”ê zêdetir tê nasîn. Taybetmendîyeka giring a navê zazayê jî ew e ku wekî nav hem ji bo dimilîyan hem jî li hin cihan ji bo kurdên kurmancîaxiv tê bikaranîn. Bo nimûne, zaravayê “zaza” di ferhenga kurdî ya Muhemmedî Xalî da, ya ku bi navê “Ferhengî Xal”ê sala 1960î li Silêmanîya başûrê Kurdistanê hatiye çapkirin, di wataya wî zaravayî da ku em bi navê “kurmancî” dizanin, hatiye bikaranîn. Ji rojhilatê Kurdistanê, Muhemmed Teqî Îbrahîmpûr di destpêka ferhenga Farsî-Kurdî da dîyar dike ku di nav civakê da ji zaravayê behdînan ra ku navê xwe ji herêma Behdînanê (Badînan) birîye, (ango ji zaravayê kurmancî ra), “zaza” tê gotin (132). Bi navê zaza navandina zaravayê kurmancî yan jî kurmancîaxivan ji kurdên bakurê Kurdistanê ra ecêb tê, lê eşîrên kurd ên ku navê wan zaza ye û bi zaravayê kurmancî diaxivin, li bakurê Kurdistanê hene. Bo nimûne, li gor ku M. Nûrî Dêrsimî dinivîse, navê qebîleyekê ji eşîrên Qoçgirîyê zaza ye; eşîrên Qoçgirîyê bi eslê xwe dêrsimî ne, ji 12 qebîleyên mezin pêk tên û bi zaravayê kurmancî diaxivin. Herwiha eşîrên kurd ên ku bi zaravayê kurmancî

diaxivin û navên wan “dumilî” ne jî hene. Wekî ku li jor jî me dabû dîyarkirin li başûrê Kurdistanê (Kurdistana Îraqê) navê eşîrekê ji eşîrên êzidîyan, dumilî ye.

Di heman demê da, eşîrin hene ku beşeka wan bi zaravayê dimilî, beşeka din bi zaravayê kurmancî dipeyive. Li gor ku Ali Kılıçî nivîsiye, li herêma Dêrsimê beşeka eşîrên demenû (demenan), alû (alan), gulû (gulan) û karsanûyê (karsanan) bi zaravayê kurmancî, beşeka wan a din bi zaravayê dimilî dipeyive (133). M. Nûrî Dêrsimî û Mistefa Duzgunî jî daye zanîn ku beşeka eşîrên dêrsimî wekî sarisaltixan, balan, kulikan, bamasuran, masikan û çakan bi zaravayê kurmancî û beşeka wan a din bi dimilîyê dipeyive (134).

Li gor Ziya Gökalpî “*Dünbülîler’e* (135) ‘Zaza’ ismini veren yine Türklerdir. ‘Zaza’ kelimesini ne bizzat Zazalar ne de Kurmanclar kullanmazlar”⁴⁸ (136) Herçiqas dema ku Ziya Gökalp dibêje “*Dünbülîler’e ‘Zaza’ ismini veren yine Türklerdir.*”⁴⁹ Palpişta wî nayê zanîn jî hin nivîskarên kurd û gelek kesan ev raman korkorane qebûl kirîye. Li gor MacKenzieyî yên ku navê zazayê li dimilîyan kirine, kurd in (mebesta wî kurmanc in) (137). Lê dema ku vê yekê dinivîse, ew jî wekî Ziya Gökalpî xwe naspêre tu belgeyan. Loma, heta ku ji hêla hin daneyên din ve neyên îspatkirin, tu sedem nîne ku ev nêrîn bê pejirandin.

⁴⁸ “Ên ku navê zazayê li dunbulîyan danîne, tirk in (135). Ne zaza ne jî kurmanc peyva zazayê bi kar nayînin”

⁴⁹ “Ên ku navê zazayê li dunbulîyan danîne, tirk in.”

Daneyên berdest nîşan didin ku dîroka peyva zazayê ji ya ku tê zanîn kevntir e. Lê ji ber ku der barê koka vê peyvê da em negihane encameka teqez, baştir e ku em li vir hin nêrîn û zanyariyên cuda yên li ser vê mijarê pêşkêş bikin.

Di destpêkê da em li wataya ferhengî ya peyva ku îro bi kar tê, binêrin. Wekî Ferhengî Xalî, ji hin ferhengên kurdî tê famkirin ku peyva “zaza”yê di kurdîya başûrî da bi wataya “nevî”yê tê bikaranîn. Di devoka dimilî ya herêmên Motkî (Mutki), Hewêl (Baykan) û hinên din da “za”, “ze” yan “zak” tên wataya “kur”ê û “zaka” jî tê wataya “keç”ê. Em ji herêma Hewêlê çend mînakên binivîsin:

Dimilî	Kurmancî
Zak o an zî keyneke ya?	Kur e yan jî keç e?
Zey to yeno.	Kurê te tê.
Cine zaka (jîjeki) rê vace.	Ji vê keçikê ra bêje.

Ji peyvên “za vû zêç”ê (zo vû zêç) yan “zar û zêç”ên di zaravayê dimilî da, peyvên “za” û “zar”ê tên wataya “zarok”ê. Herwiha di hin gotinên nifir û dijûnan da peyva “za”yê bi wataya “kur”ê tê bikaranîn.

Dimilî	Kurmancî
Kutik zay kutiki	Kûçik kurê kûçikî
Kopek zay kopeki	Kûçik kurê kûçikî

Wekî ku ji van peyvên jêrîn jî dixuye, vê watayê di hin peyvên hevedudanî yên ku di zaravayê dimilî da têrbelav in, xwe parastîye:

Dimilî	Kurmancî
Warîza/wereza	Xwarzî
Bîraza/bîrarza	Birazî
Dedza/deza/datîza/dayza/dereza	Pismam
Xalza/xalîza	Pisxal
Yaykza/yeykîza	Pisxalet
Emîza	Pismet

Di hin peyvên hevedudanî yên zaravayê hewramî da jî peyva “za”yê tê dîtîn. Bo nimûne:

Kurreza: Kurê kurî, nevî.

Kînaçeza: Kurê keçê (138).

Di zaravayê kurmancî da peyva “zî”yê bi gelemperî şûna peyva “za”yê digire. Bo nimûne: birazî, xwarzî

Di hin ferhengan da peyva “xwarza”yê di kurmancîyê da wekî “keça xwişkê”, (139) û peyva “birazî”yê jî “keça birayî” tê şîrovekirin (140). Ango peyvên “za” û “zî”yê di kurmancîyê da carinan hem bi wataya “kur”î hem bi ya “keç”ê tînin bikaranîn (141). Peyvên “zar”, “zaro”, “zarok”ê di kurmancîyê û “zarole”yê di kurdîya başûrî da ku tînin wataya “zarok”ê jî peyva “za”yê hatine (paşgirên “-ok” û “-ole”yê ku li dawîya peyvan in, paşgirên biçûkkirinê ne).

Herwiha di zaravayê dimilî da dema ku tê gotin “zay datizay” (kurê pismamî), “zay xalîzay” (kurê pîsxalî, nevîyê xalî) peyva “za”yê di wataya “kur”î da ye. Li beranber wan, peyvên “amozaza” (kurê pismamî) û “xalozaza”yê (kurê pîsxalî) di kurdîya başûrî da û “brazaza” (nevîyê birazayî) (142) di hin devokên kurdî da tên bikaranîn. Peyva “zaza”yê ya ku di van peyvên hevedudanî da derbas dibe, bi wataya “nevî”yê ye.

A. M. Menteşaşvîlî qala vê mijarê dike; li gor wî “aza (wataya wê ya ferhengî: ‘kurê yekî’ yan ‘jiyekibûn’) nîşaneyê veqetandina nîfşekê ji vê grûpê ye. Dubarekirina vê têgihê nîşana jihevduketina du nîşan e. Bi vî awayî kurê kurî ‘kurraza’ ye.” (143) Koka peyva “aza”yê ya ku Menteşaşvîlî nivîstîye, divê “za” be. “A”ya ku li destpêkê ye (ya rastî “e” ye) jî ji bo girêdana du peyvan hatîye zêdekirin; wekî ku di peyva “kurraza”yê (ne kurraza) da (kurr + e + za).

C. J. Rich peyva zazayê wekî “keke” û kesên ku gotinên wan nayên famkirin, şirove dike. MacKenzie qala wê texmîna peydabûna peyva zazayê dike ku dibêje ev peyv ji zêdebûna dengê “z”yê ye di axiftina dimilîyan da peyda bûye (144). Celadet Bedirxan jî di vê biwarê da bi bîr dixê: “Eger ji dumilîyan ra ji ber ku dengê “j”ya kurmancî wekî “z”yê bi lêv dikin, zaza hatibe gotin, dumilîyên Palo û Madenê ji dumilîyên Sêwregê zazatir in (145).

Ji alîyê din ve, balkêş e ku ravekirina Richî bi karên fransî “zézayer” an “zozoter” ra digunce. Çinku kara “zézayer”yê tê wataya “devlalîkî”yê angî bilêvkirina dengê “j” û “ş”yê wekî

“z” û “s”yê. Li vir li şûna tesadufê, dibe ku C. J. Richî dema ku peyva “zaza”yê şirove kirîye, ji kara fransî “zézayer” îlham girtibe⁵⁰ (146).

Nivîskar û wergêrê kurd Şukur Mistefa jî agahdarîyeka mîna ya Richî dide; dibêje ji ber ku kurmancên ku li medreseyên başûrê Kurdistanê dixwendin pirî caran peyva “ji”yê bi kar tanîn, ji wan ra “jê” dihat gotin. (wekî ku tê zanîn di zaravayê kurdîya başûrî da li şûna “ji”yê peyva “le”yê bi kar tê) (147). Em nizanin ka navê zazayê ji van taybetîyên cuda yên bilêvkerin û axiftinê hatiye yan na, lê rast e ku dengê “j” ya kurmancî di zazakîyê da carinan dibe “z” carinan jî “c”. Bi taybetî jî di devoka dêrsimî da dengên “j” û “ş”yê di devokên din da vediguherin dengên “z” û “s”yê, yan jî di hin peyvnan da veguhartineka berevajî heye.

Hin kurdên başûrê Kurdistanê ji min ra gotîye ku ji ber hinek eşîrên kurmanc ên herêma Barzanê ku di axiftina xwe da pirî caran peyva “za”yê bi kar tînin, bi navê “zaza”yê (za-za) hatine navandin.

Hin kes angaşt dikin ku peyva zazayê ji peyva “sasan (sasanî)”yê hatiye, hin jî dibêjin ku ev peyv li ser nivîsên kevirî yên kevn hatiye dîtin (148). Bi rastî jî di navbera salên 522-486an da bz di serdema hikimdariya Darayî (Dariyûs) da, nêzî Babîlê qala “Zazâna”yê hatiye kirin (149). Navê Zazayê berî hezarên salan, di hin çavkanîyên din ên berîya zayînê da jî hatiye dîtin. Bo nimûne Ninni-Zaza (Nini-Zaza) ku yek ji peristgehên sumeran e li Marîya Mezopotamyaya Jêrîn di

⁵⁰ Li ser daxwaza nivîskarî (Malmîsanij) me ji vir du hevok derxistin.
[nota wergêran]

salên 3000 bz da hatiye dîtin (150). Ninni-Zaza (Nini-Zaza) navê xwedawendeka sumeran e jî. Di hin çavkanîyan da jî behsa Peristgeha Ninni-Zazayê yan jî Ìnnana-Zazayê tê kirin ku li bajarê Urê ye.

Di nav navên şûnwarên kevn da jî navê “zaza”yê tê dîtin. Li gor ku Halisî [Ataksoy] nivîsîye, kirhuyî di sala 880yî bz da ji bo ku silavê bidin Asur-Nazirpalî ber bi koşka bi navê “Zaza-Buha”yê ve bezîn. Li gor dîrokname fransî Gaston Maspero, dibe ku ev “Zaza Buha li quntara Çîyayên Mihrap û Kervançemenê be” (151). Îro jî zaza li herêma Madenê ku Çîyayê Mihrabê lê ye, dijîn (152).

Divê em bi bîr bixin ku hîn tam ne zelal e bê ka têkilîyek di navbera peyva zazayê ya bêjeyên “Zazâna”, “Ninni-Zaza”, “Ìnnana-Zaza” û “Zaza-Buha”yê û navê zazayên îro da heye yan na. Ji bo zelalkirina vê mijarê pêwîstî bi lêkolînên berfirehtir heye. Lê li gor zanînen me yên îro, tu pêwendîya van navan û peyva “zaza”ya îro tune ye⁵¹.

Hin nivîskar jî dibêjin dibe ku pêwendîya peyva zazayê bi Zûzanîyeyê (Zawzan) (153) ra ku herêmeka dîrokî ye (154) hebe. Li gor Muqeddesî (jidayikbûn sala 966an) “Zewzan” nahîyeyeka Cezîre-i Ìbnî Omerê (Cizîra Botanê) ye. Li gor Ìbnu'l-Esîrî (1160-1234), El-Zewzan “bi rêwîtiya du rojan ji Mûsilê dûr dest pê dike heta derdora Xelatê [Ahlat], ji hêla Azerbeycanê jî digihîje Selmasê.” (155)

Li dawîyê, der barê wataya peyva “zaza”yê da hin şirove hene ku ew û wataya duyem a kird û kirmancê, ya ku me li jor qala wê kiribû, li hev tên. Li gor wan “di kurdîyê da zaza ew kes

⁵¹ Nivîskarî (Malmîsanij) ev hevok nû lê zêde kir. [nota wergêran]

in ku ne mensûbê tu eşîrê ne. Li cem eşîran tu rûmet û îtibara wan tune ye û wekî revdeyeka xizmetkar tên hesibandin.” (156) Lê belê ev şîrove heta cihekî şaş e. Çinku hem di nav zazayan hem jî di nav kurmancan da eşîr jî hene û kesên ku ne mensûbê eşîrê ne jî hene. Ango zaza ne di hevwataya “kurdên nemensûbê eşîr” da ye. Mark Sykes hem behsa zazayên “eşîr” hem jî zazayên “derveyî eşîr”ê dike (157).

Der barê vê mijarê da nêrîneka cuda dîsa Mark Sykes vediguhêze. Em ji nivîsên wî yên destpêka sedsala me hîn dibin ku efsaneyek heye dibêje ku “Kurmancên Motkanê koleyên zazayan in.” (158)

Kaygusuz Abdal yek ji helbestvanên gelêrî yên tirkên sedsala 15an e. Yek ji kevntirîn tekstên ku bi aşkerayî qala zazayan dike, ev çarîna wî ye.

“Eğer bu sene çıkar isem yaza

Toplayım bir parça Gürcü Abaza

Elime geçerse on kadar Zaza

*Yolar sakalımı kavlak satarım*⁵² (159)

⁵² “Eger ez îsal bigihîjim havînê

Berhev bikim komek ji Gurcî û Abaza

Eger bikevin destê min qasî deh Zaza

Ez ê rihên wan kur bikim û qeşûrîkî bifiroşim.”

Ewlîya Çelebî yê ku di sedsala 17an da jîyaye, di geştnameya xwe ya navdar da dema ku zarava û devokên kurdî⁵³ dihejmêre, zazakîyê li pêşîn bi cih dike. Ewlîya Çelebî zazayan jî bi ser eşîrên kurdan ve dihesibîne; eşîrên kurdan ên ku havînan ber bi zozanê Çîyayê Sîpanê ve diçin (160). Di rabirdûyê da zaza ne her dem li cihê xwe yên îroyîn bûn, giringîya van zanyarîyan ew e ku cihê belavbûna zazayan di dema Ewlîya Çelebî da dîyar dikin.

Di destpêka sedsala me da hema bibêje zazayên tam koçer nemane. Li gor ku Ziya Gökalpî nivîsiye, di salên 1920î da tenê zazayên Ziktê (Zikdê) koçer in, ên din cihwarbûyî ne (161).

Em ji çavkanîyên nivîskî dizanin ku di nivê yekem ê sedsala 18an da li nêzî Dîvrîgîyê eşîreka zaza hebû û li vê herêmê di nav navên kesan da navê “Zazan”ê jî dihat dîtin (162). Îro jî li heman herêmê, li navbera Sêwaz û Kangalê, peyva zazayê wekî navê cih heye (163). Herwiha wekî me berê jî dabû dîyarkirin, di heman herêmê da di nav eşîrên Qoçgirîyê da qebîleyeka zaza heye û bi zaravayê kurmancî dipeyive (164).

Di nav hin çavkanîyên kevn ên rojavayî da jî peyva zazayê heye. Bo nimûne, Carsten Niebuhr, di çapa fransî ya pirtûka xwe *Reise in Arabien und Persien* ku di sala 1780yî da çap bûye, eşîrên “zaza”

⁵³ Malmîsanijî, paşê di gotareka xwe da wisa nivîsiye:

“Ewlîya Çelebî dema ku di geştnameya xwe da li ser eşîrên kurdan dinivîse, behsa van navan dike: zaza, lulu, zibari, pisani, karkarî, kurds.” (M. Malmîsanij, “The Kırmanjki (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues it Faces”, in H. Bozarslan, C. Gunes, & V. Yadirgi (eds), *The Cambridge History of the Kurds*, Cambridge University Press, Cambridge, 2021, r. 667) [nota wergêran]

û “dembalî”yê (dömbalî) jî di nav eşîrên kurd ên koçer da dihesibîne. Li gor wî, eşîra zazayê di nav Sêwreg û Erziromê da, eşîra dembalîyê (dömbalî) jî li başûrê herêma Dîyarbekirê wekî koçer dijîn (165). Berî wê bi gelekî, geştyarekê bi navê Affonso (166) jî behs dike ku roja yekem a sala 1566an, çûye cihekê bi navê Dumbulyê ku ji bajarê Dîyarbekirê bi mesafeya du rojan dûr bûye, bi qasî ku tê famkirin ev Dumbuly li hêla başûrê bajarê Dîyarbekirê bûye.

Gaetano Solanelli yê îtalî, di nivîseka xwe da ku di sala 1882yan da li Romyê hatîye weşandin, kurdîyê wekî kurmancî û zazayê (curmangî, sasa) dike du beş (167).

Oskar Mannî di destpêka sedsala me da beyteka kurdî berhev kirîye, tê da peyva “zaza”yê⁵⁴ (168) derbas dibe ku bi herêma Şemzînanê (Şemdînan) ve jî pêwendîdar e.

“Cuabê binêrîn bo Şemzînan

Suar bin le esp û zînan

Bo şawqî Mem û Zînan

Canan! Bikeyn tekbîr û rae!

Cuabê binêrîn bo zazaê (169)

*Suar bin le bo em sifae.*⁵⁵ (170)

⁵⁴ Li ser daxwaza nivîskarî (Malmîsanij) me jêrenotek ji vir derxist. [nota wergêran]

⁵⁵ Li ser daxwaza nivîskarî (Malmîsanij) me ji vir paragrafek û çar jêrenotên wê paragrafê derxistin. [nota wergêran]

Berê me di beşa dimilîyan da jî dabû dîyarkirin ku hin çavkanîyên nivîskî amaje bi wê yekê dikin ku eşîra dimilîyan di dema Şah Îsmailî da ji Îraqê koçî Dêrsimê kirîye. M. Emîn Zekî der barê vê mijarê da di pirtûka kurdî ya bi navê Kurd û Kurdistan da hin tiştên giring nivîsîne. Li gor ku wî dîyar kirîye (171) di dema Yavuz Sultan Selîmî da hin eşîrên kurdên ku ji herêma Dêrsimê koç kirine, hatine “Cezîreya Şîmalî” û li vir bi ereb, ermen û kurdan ra têkilî hev bûne û hemû asîmîle kirine. Van eşîran zivistan li deştên başûrê Qerejdaxê, mehên nîsan û gulanê li deşta Cezîrê, havîn jî li herêma Dîyarbekirê derbas kirine. Li gor heman nivîskarî, *“Sincar Yezidileri doğal teşkilatları bakımından aynen Dersim Kürtleri gibidirler, saçlarını uzatır ve örerler. Giysileri komşularınki gibidir. Kendi değişlerine göre, Timur Lenk [1336-1405] zamanında buraya [Sincar’a] göç etmişlerdir.”*⁵⁶

Ev şîrove, têkilîyeka dîrokî ya kurdên êzidî yên ji herêma Şengalê ku di nav sînorên dewleta Îraqê ango başûrê Kurdistanê da ne û kurdên li herêma Dêrsimê piştrast dike.

Bi vê boneyê em dîyar bikin ku êzidîtî, berî Yavuz Sultan Selîmî, bo nimûne di sedsala 13an da, di nav kurdên herêma Meletîyê û di nav Germîyanîyan, ên ku piştra li rojavayê Anatolyayê hatine bicihkirin, da hebû (172).

⁵⁶ “Êzidiyên Şengalê ji alîyê rêxistina xwe ya xwezayî ve wekî kurdên Dêrsimê ne, porê xwe dirêj dikin û dihûnin. Cil û bergên wan wekî yên cîranên wan in. Bi gotina wan, di dema Timur Lenkî da [1336-1405] koçî vir [Şengalê] kirine.”

Peyva “Zaza” yê Wekî Navê Cihî

Li dawîyê em çend gund û cihên bi navê “Zaza” yê bînin bîra we:

1. Gundê “Zaza” yê yê girêdayî navenda bajarê Sêwazê.
2. Gundê “Zazalar” ê yê girêdayê Esesa Erzinganê.
3. Gundê “Zazalar” ê yê girêdayî navçeya Çatê ya Erziromê.
4. Gundê “Zaz” ê yê navçeya Midyadê (173).
5. “Zazan” li başûrê Kurdistanê (174).

6. Wekî ku li jor jî hat dîyarkirin, peyva “Zaza” yê li herêma di navbera Kangal û Sêwazê da wekî navê cihekî heye (175).

7. Wekî ku di beyta “*Heyran, jaro, ji Zazatê heta Dyûrbatê*” (176) da tê dîtin, di hin stranên gelêrî yên kurmancî da (li herêma Zaxoyê) navê “Zazat” ê tê bikaranîn. “Zazat” di erebî da pirhejmarîya peyva “Zaz” ê yan “Zaza” yê ye⁵⁷ (177).

9. Li gor ku hevalekê min ê ji “Pawe” yê ji min ra got, li rojhilatê Kurdistanê (Kurdistana Îranê) li herêma Nawsudê ku zaravayê hewramî lê tê axaftin û ev zarava bi nêzîkbûna xwe ya bi zaravayê dimilî ra tê nasîn, nêzî gundê “Kemine” yê bi navê “Zaza Ra” (Rêya Zaza) rêyek heye, herwiha li başûrê rojhilatê Paweyê bi navê “Qulê Zazî” (Girê Zazî) girekê mezin heye. Lê divê em diyar bikim ku em nizanin ka têkilîya vê “zaza” ya “Zaza Ra” û “Qulê Zazî” bi “zaza” (dimilî) ra heye yan na.


⁵⁷ Li ser daxwaza nivîskarî (Malmîsanij) me ji vir hevokek derxist. [nota wergêran]

Tê famkirin ku peyva zazayê di qadeka fireh da belav bûye û cih bi cih di watayên cuda da tê bikaranîn.

Piştî agahdarîyên jorîn, di encamê da mirov dikare bibêje ku hem navên “kird” û “dimilî”yê hem jî navê “zaza” û “kirmanc”ê ku li Dêrsimê tên bikaranîn, ji bo heman civakê ne. Taybetmendîya wan a hevpar ew e ku di dem û cihên cuda da herçiqas bi awayekê cuda bên bikaranîn jî timî wekî navekî ji bo beşekê an eşîreka kurdan tên bikaranîn.⁵⁸

⁵⁸ Malmîsanijî, paşê di gotareka xwe da wisa nivîstîye:

“... peyvên ‘zaza’ û ‘zazakî’ yê bi piranî ji aliyê biyanîyan, ewên ku bi vî zara-vayî napeyivin ve tên bikaranîn; ango ev nav navên derveyî ne. Zimannas û lêkolerên ewropayî bi rêya tirkên û zimanê tirkî hînî van peyvan bûne û van bi kar tînin. Di literatura rojavayî da navên xwemalî (hundirîn), ango ‘kirmanc’, ‘kirmanckî’ û ‘kird’, ‘kirdki’ nayên bikaranîn.” (M. Malmîsanij, “The Kırmanjki (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues it Faces”, in H. Bozarslan, C. Gunes, & V. Yadirgi (eds), *The Cambridge History of the Kurds*, Cambridge University Press, Cambridge, 2021, r. 668) [nota wergêran]



ÇAVKANÎ Û NOT

(1) Di vê nivîsê da navê pirtûk û gotinên ku bi erebî, farisî û kurdî ne, min bi alfabeya kurdî nivîsîn.

(2) Ji bo nivîs û pirtûkên ku li ser zaravayê dimilî yan jî dimilîyan hatine nivîsîn bnr Malmîsanîj; "Bîblîyografiya Dimilî (Zaza), *Hêvî* (kovara çandî giştî), Parîs, no: 3, 4, 5, 6, 7

Herwiha bnr Kadri Cemil Paşa (Zinar Silopî), Doza Kurdistan (Kürdistan Davası) Kürt Milletinin 60 Yıllık Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıraları, İkinci basım, Özgür Gelecek Yayınları, Ankara, 1991, r. 250-254

(3) Li Dêrsimê di nav civakê da ji bo cudakirina zaravayê dimilî û kurmancî hin caran ji yê yekem ra "so-bê", ji yê duyem ra jî "herre-were" tê gotin. Hevwataya "so-bê" ya dimilîyê, bi kurmancîyê "herre-were" ye.

Di hin çavkanîyan da di cihê "so-bê" yê (şo-bê) da "bê-şo" jî hatiye nivîsîn. (Zilfo Xaskar, "Dımılı Kürtçenin Lehçesidir", *Yeni Ülke*, İstanbul, yıl: 2, no: 5 (17-23 Kasım 1991))

Bi vê hincetê em dîyar bikin ku kurdîya goranî (hewramî), di nav civakê da hin caran wekî "maço" (yan jî maço-maço) tê navandin ku wataya peyva "maço" yê di vî zaravayî da "dibêjim" e.

Bnr Mîrza Şukrullah Senendecî (Fexru'l-Kuttab), Tuhfeyê Nasirî Der Tarîx o Coxrafayê Kordestan, Be înzîmamê pênc meqale der bareyê qebailê Kord ez Doktor Heşmetullah Tebîbî, Tehran, 1366 [1987], r. bîst û çar

(4) Çi heyf e ku heta îro li ser kurdîya şêxbizinî ya ku li Tirkîyeyê tê axaftin, lêkolîn nehatîye kirin. Eger em çend stranên gelêrî yên ku Mehmûd Lewendî ji devê çend gundîyên ji gundê Gozgozê yê girêdayî Haymana ya Enqereyê nivîsîne nehesibînin, kurdîya şêxbizinî nehatîye nivîsîn. Li gor ku Lewendî û çend nivîskarên din dîyar dîkin, kurdîya şêxbizinîyan nêzî kurdîya başûrî ye.

Bnr Mahmut Lewendi, "Jî Hêla Haymanayê Çend Sitrên Şêxbizinîyan", *Çarçira* (kovara çandeyî ya giştî), no: 3 (tebax 1986), r. 3

(5) Ji bo nirxandineka van tekstan bnr Malmîsanij, "Ondokuzuncu Yüzyılda Kırd (Zaza) Aşiretleri Arasındaki Çatışmalar", *Studia Kurdica*, Paris, no: 1-3 (Nisan 1985), r. 72-78

(6) Îro bi navê Nêribê heft gund girêdayî Hênê ya Dîyarbekirê ne: 1. Nêribê Axan (Kuyular) 2. Nêribê Melikan (Bozok) 3. Nêribê Çulagan (Abacılar) 4. Nêribê 'Elîyan (Atıcı) 5. Nêribê Wisifan (Çukur) 6. Nêribê Topalan (Topçular) 7. Nêrib-Cimsat.

(7) Peter J. A. Lerch, Forshungen über die Kurden und die iranischen nordchaldäer, St. Petersburg, 1857-1858 (çapa nû: Amsterdam, 1979), r. 78

8) Ji bo zanyarîyên bêhtir li ser Ehmedê Xasî bnr [Malmîsanîj], "Zaza (Dîmîlî) Lehçesinde Yazan Bir Ozan: Melay Xasî", Devrimci Demokrat Gençlik (dergi), İstanbul, no: 2 (Mart 1978), r. 14

[Malmîsanîj], *Hêvî* (kovara çandîya giştî), Parîs, no: 4 (Îlon 1985), r. 75-76

(9) Ehmedê Xasî, Mewlidê Nebî, Litoğrafya Matbaası, Dîyarbekir, 1899

(10) Harûn, "Yew Beyta Mîridanê Şêx Selahedinê Şêx Se'îdî", *Armanç*, Stockholm, no: 128, r. 10

(11) Ziya Gökalp, Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik İncelemeler, Komal Yayınları, Ankara, 1975, r. 51

(12) Kemal Badıllı, Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kurmancca Lehçesi), 1965, r. 6

(13) Gwevdereyic, "Çolig", Demokrat (kovara sıyasi û çandî), no: 7 (Adar 1990), r. 20

(14) Ê ku ji Polybeo, Storie, V, 52, 5 veguhastîye: Îslâm Ansiklopedisi, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 1977, c. 6, r. 1090.

Ê ku ji Strabon, Geografia, XI, 13, 3 ve XV, 3, 1 veguhastîye: Îslâm Ansiklopedisi, c. 6, r. 1090.

A ku ji Tito Livio, Ab Urbe condita libri, XXXVII, 40, 9; XLII, 58, 13 veguhastîye: Mirella Galeti, Kurd û Kurdistan Le Nûsrawekanî Îtalî da (Le Sedey Sêzdem Ta Nozdem), Wergêrranî: Casim Tofîq, Binkey Hengaw, Stockholm, 1987, r. 83.

Bi vê hincetê em dîyar bikin ku çavkanîya erebî ya herî kevn a ku qala kurdan dike ji dema Elî bin Ebî Talibî (Hezretê Elî) ye ku di sedsala 7an da jîyaye (bnr Yearbook of the Kurdish Academy, Almanya, 1990, r. 19)

(15) Ziya Gökalp bi vê hincetê dîyar dike ku “eşîr” ango “eşîret” ne girêdayî hikûmetê ne û kurdên çîyayî wan bi navê “kurmancên reş” dinavînin (bnr Ziya Gökalp, her ew berhem, r. 72).

(16) B[asile] Nikitine, Les Afşars d'Urmiyeh, Paris, 1929, r. 114

(17) M. Dûzgûn, “Torêy ve Adetê Dersimî”, *Berhem* (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no: 1 (Şubat 1988), r. 37

(18) Mustafa Düzgün, “Dersimli Memik Ağa”, *Berhem* (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no:10 (Ocak 1991), r. 71

(19) Zilfî, “Ferhengok Dîmîlki-Kurmanci-Tırki”, *Hêvî* (kovara çandîya giştî), Paris, no: 1 (Îlon 1983), r. 113

(20) Şeref Han, Şerefname, Arapçadan çeviren: Mehmet Emin Bozarslan, Ant Yayınları, İstanbul, 1971, r. 190

(21) M. Dûzgûn, “Torêy ve Adetê Dersimî”, *Berhem* (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no: 1 (Şubat 1988), r. 37

(22) Zilfo Xaskar, her ew cih.

(23) Peyva “kurmanç”ê ya ku Zilfo Xaskarî daye di çavkanîyîn din ên têkildar da “kirmanc” hatîye nivîsîn.

(24) Zilfi, “Folklorê Kurdi ebe Zarava Dîmilki”, *Hêvî* (kovara çandîya giştî), Paris, no: 2 (Gulan 1984), r. 114.

Ji bo heman stranê bnr “Dersim Yöresinden İki Halk Türküsü”, *Özgürlük Yolu* (aylık siyasi dergi), no: 30 (Kasım 1977), r. 94.

Haydar Dêrsimî, “Derê Laçî”, *Hêvî* (kovara çandîya giştî), no: 6 (Tebax 1986), r. 116.

Firat, “Derê Laçî”, *Hêvî* (kovara çandîya giştî), no: 4 (Îlon 1985), r. 121.

Hemedê Mamekiz, “Derê Laçî”, *Kurdistan Press*, Stockholm, no: 71 (27. 4. 1989), r. 9.

(25) Zilfi, “Folklorê Kurdi ebe Zarava Dîmilki”, *Hêvî* (kovara çandîya giştî), Paris, no: 1 (Îlon 1983), r. 93

Ji bo varyanteka din a vê stranê bnr Firat, “Seyd Uşe”, *Hêvî* (kovara çandîya giştî), Paris, no: 4 (Îlon 1985), r. 121

(26) Firat, “Folklorê Dersimî ra-II”, *Hêvî*, no: 5 (gulan 1986), r. 106.

Li ser mijara kuştina “Bava”yî bnr Dr. Vet. M. Nuri Dersimî, *Kürdistan Tarihinde Dersim*, Halep, 1952, r. 272.

(27) Di Rojnameya Cumhurîyetê da, di 27ê tebaxa 1937an da hatîye nivîsîn ku “Duh, serokê eşîra Bextîyar[an] Şahîn û apê xwe hatin kuştin.” (Veguhêzer: *Yakın Tarih Ansiklopedisi*, c. 10, İstanbul, 1989, r. 96).

(28) Munzur Çem, Gülümse Ey Dersim (roman), c. I, Özgürlük Yolu Yayınları, Köln, 1990, r. 304-310

(29) "Dersim Yöresinden İki Halk Türküsü", Özgürlük Yolu (aylık siyasi dergi), no: 30 (Kasım 1977), r. 92-94.

Ji bo varyantên heman stranê bnr Firat, "San", Armanc (ji mehê carekê derdikeve), Stockholm, no: 88 (Çileyê paşîn 1988), r. 10; no: 91 (Nîsan 1989), r. 10.

(30) Hawar, "Çend Lawîkê Qemê Arêyîzî", *Berhem* (kovara lêkolînên civakî û çandî), Stockholm, no: 3 (îlon 1988), r. 59

(31) Uşxan, "Dersim ra", *Armanc*, no: 80 (Gulan 1988), r. 10

(32) Uşxan, "Dersim ra", *Armanc*, no: 81 (Hezîran 1988), r. 10

(33) Hasan Dewran, "Ez Ho ra Pers Kon", Mızgîn (kovara agahdari û peywendiyê ji bo kurdên Almanya Federal), Bonn, no: 4 (1/1986), r. 33

(34) Ayre, Stockholm, no: 11 (adar 1987), r. 2

(35) 22 Ekim 1950 Genel Nüfus Sayımı, TC Başbakanlık İstatistik Genel Müdürlüğü, İstanbul, 1961, r. 142-144

(36) Li gor ku Bruinessen vediguhêze, di xebata E. B. Soanî ya ku di sala 1912an da hatîye weşandin, wiha hatîye nivîsîn: "Ji 20 eşîrên ku hatine rêzkerin 9 ji wan ji xwe ra 'kirmanc' digot. Ev eşîrên Başûrê bûn. Wekî: pijder, bilbas,

şîwan û baban.” (Martin van Bruinessen, Ağa, Şeyh ve Devlet Kürdistan'ın Sosyal ve Politik Örgütlenmesi, Özgür Gelecek Yayınları, Ankara, 1991, r. 411)

(37) Hin ferhengên ku cih dane vê peyvê, ev in:

Muhemmedî Xal, Ferhengî Xal, c. III, Çapxaney Kameranî, Silêmanî, 1976, r. 84.

Hezretê Ayetullah Aqay Şeyx Muhemmed Merdûxê Kordestanî, Ferhengê Merdûx, Senendec, 1362 [1983], c. II, r. 386.

Gîw Mukriyanî, Ferhengî Mehabad, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 1961, r. 476.

Hejar, Henbane Borîne/Ferhengê Kordî-Farsî, Tehran, 1369 [1991], c. II, r. 612.

